


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



24
1989

NAVEROK

Helbest: Wın Derbas nabın - GUNDÎ.....	3
Bı hezaran kes tevi civına cenazê M. ŞEXO bûn.....	4
Nameyek derheqa rojnameyên Kurdi da.....	6
Çend Çarin - BARAN	7
Şair Heme Seidê Hesên - F. Gerdi.....	8
22'ê Nisanê tê pirozkırın.....	10
Kurdên Gurcistanê - Leyla ÇILDERGÛŞÎ.....	11
Jı Dıroka Kurdistanê	
Jı Gernama Ewliya Çelebi.....	12
Baba Tahır Uryani - N. REŞO.....	14
Konferansa " Mafên Mırovati Lı Kurdistanê"	16
Lı ser Kurdistanê û Tırkiyê	
Dıtınên Heyeteke Eyaleta Saksonyaya Jêrin.....	19
Disiplin- A. MAKARENKO.....	24
Weşanên Nû.....	27
Lec- Zeynel KURUCALI.....	28
Quncıkê Zarokan.....	30

Sal: 10

Hejmar: 67, Heziran 1989

XWEDÎ : KOMKAR-Swêd
BERPIRSIYAR : Şêroyê BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B
113 58 Stockholm
TELEFON : 08/ 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk Kurdiska
Arbetarföreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Ş.BOTAN
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B
113 58 Stockholm
TELEFON : 08/ 32 82 51
PG : 458980 - 0

Win derbas nabın (No pasaran!)

Win derbas nabın, em hene
Em netewın, win derbas nabın
Em diroka dūr û dirêj in, win derbas
nabın

Em jiyan in, win derbas nabın
win derbas nabın

Nalinên birindar û nexweşên me
Dibın bahoz û bareş li dor konên we
Hêstirên dayikên me lêmîşt û tofan

in

Lı ser rêya we
Lı ser rêya we
Her hêstrek: No pasaran!
Her nalinek: No pasaran!

Win minalan dikujın
Win kal û pıran
jin û mêran

Dıdın ber qurşinan.. dikujın
Win biharê dişewıtın
ar û alafan dıbarın
Lê win derbas nabın, ev kuştıyên me
ne
ev gornên me ne

Kuştına minalan: No pasaran!
Şewtandına biharan: No pasaran!

Her şehideki me
-çıqas pırın şehidên me-
Sondeka gran e: No pasaran!
Her gorneka me
-çıqas pırın gornên me-
Bang û hêlan e: No pasaran!
Her Helebceyeka me
-çıqas pırın Helepceyên me-
Çang û azan e: No pasaran!
Win derbas nabın: No pasaran!
No pasaran!

Ey Deh'akên dema me!
Ey xûnrjên gelê me!
Em xurtırın jı we

jı balefirên we
Em xurtırın jı kimya û gazan
jı alaf û şewatan
Em xurtırın jı va cihana derewın
jı bazar û kırın
jı bazar û kırın

Ev ax û ofên me
Ev kula dilê me
Ev kela xûna me
Lı ber bê naçın
Wında nabın
Namrın...

Bo gotına: " Ez Kurd ım"
Tên ser milên me ev barên gıran
Lê disa em Kurd ın
Bê guman em Kurd ın
Dı tariya zindanan da em Kurd ın
Dı nav lepên celladan da em Kurd ın
Lı bakûr em hene
Lı başûr em hene
Lı rojhilat
Lı rojava
Lı her derê em hene
Em Kurd ın, win derbas nabın
Em pêşmerge ne, win derbas nabın
Em canfida ne, win derbas nabın
Na, win derbas nabın: No pasaran!
No pasaran!

GUNDİ
07.05.1989

Bî hezaran kes li ser tîrba hunermend
MIHEMED ŞEXO
civîyan û ji bo rîzgariya welat sond xwarin

R. HEMO

"Xeberên reş zû belav dibin", wilo gotine mezinên me Kurdan û iro em nebiyê wan ji wilo dibêjin. Rastiya vê gotinê, xwe careke din nişan da di jiyana me da.

Erê, dem dema destpêka bîharê; sal sala 1989, meh meha Adarê bû. Wê şevê ji ezmanê ser Qamişlo stêrkeke ronik rîjiya erdê. Ji ber vê bûyerê, stêrkên der-dora wê ji xemgin bûn, stûyê xwe xwar kîrîn, ronahiya xwe kêmkîrîn û bajarê Qamişlo kete nava bêdengiyê ke kûr û tariya şeva reş. Dengê qêrîn û girî li vi bajarî, di maleke piçûk de ev bêdengi û tariya reş çirand, xwe gihand ciran, malbat, dost û hevalên gelê Kurd. Ewîl kesekî bî guhê xwe bawer nekîr, xwestin bîkenin lê nikaribûn bîkenin. Nikaribûn bigrin ji, bî carekê şaş man. Zîmanê wan di devê wan de nedigeriya ku tişteki bêjin. Weke ava germ bî ser wan de were rijandin. Ling û destên wan xwe nedilivandin.

Lê pîr neçû xebera reş xwe hêdi hêdi bî Kurdan da qebûlkîrîn. Bî rasti ji, gelê Kurd ne biyanê xeberên weha ye. Jiyana wan bî kul û derdan ve hatiye domandin û hin ji usa didome.

Di bîhara isal de derdeki wana yê dîn ji zêde bû. Sîba 9'ê Adarê 1989 de Mihemed Şexo rîhê xwe teslim kîr, çavên xwe girt û xatîrê xwe ji gelê xwe yê ku destê wi jê nedibû xwest û çû ser heqîya xwe.

Navê wi Mihemed Salîh, paşnavê wi ji Ahmed bû. Ew di sala 1948 de li gundê Gîrbawê nêzîkî bajarê Qamişlo tê rûyê dînê. Navê diya wi Fatma û yê bavê wi ji Şêxmûs bû. Ji xwe navê Mihemed Şexo, ji navê wi û yê bavê wi hatiye çêkîrîn. Ango li Kurdistanê zarok, bî pirani li ser navê bavên xwe tên binavkîrîn. Mihemed Salîh ji, li ser navê bavê xwe dihat naskîrîn. Weke Mihemed kurê Şexo, an ji Mihemedê şexo, an ji Mihemed şexo. Wi zarotiya xwe li gundê Xecokê derbaz kîriye û 6 salan xwendina ewlî ji li wi gundi xwendîye. Dû xwendina ewlî wi, li Qamişlo dest bî xwen-



Mihemed Şexo

dîna navende kîr û ew ji di sê salan de qedand.

Sitranebêjê azadiyê, alikarê şoreşê

Xebata Mihemed Şexo ya muzîkî, mîrov dikare bêje bî hatîna wi ya Qamişlo destpêkîr û her roj ev pêşve bîr. Kar û barê wi ji bo pêşketîna netewa Kurd bû. Dema ku şoreşa Kurdistanê Iraqê germ bû, wi berê xwe da gelê xwe û çû nava şoreşê. Bî deng û awazê xwe, bî kar û barê xwe alikariya gelê xwe kîr, alikariya şoreşê, kîr.

Pîştî şikandîna şoreşa Kurdistanê Iraqê, ew ji wek gelek Kurdên dîn derbasi Kurdistanê Iranê bû û li wê derê bî Kurdeke Kurdistanê Iranê ra zewicî. Qasi sê salan ew li Iranê jîyan û dûre vegeriyên Sûriyê.

Li Kurdistanê Sûriyê, sê zarokên wan çêbûn, keçek û du kur: Felek, 12 salî; Brahim, 9-10 salî; Bîrûsk ji 8 salî bû dema bavê wan ji nav wan barkîr çû. Lê zarokên wan ê çaran ji, hin li rê ye, çî mixabîn ku ew ê bavê xwe nebîne. Lê gelê Kurd, wê kar û barê bavê wan û wan bî xwe ji ji bir neke.

Gelê Kurd, Mihemed Şexo weke daxwaza



Bı deh hezaran kes tevi çivina cenazê Mihemed Şêxo bûn

wi, ew li bajarê Qamişlo dî nava axa Kurd û Kurdistanê de kirin erdê. Definkirina Mihemed Şêxo, ne weke de-finkirina hemûya bû, wi wî-lo dixwest û wîlo digot dî straneke xwe de:

*"Gava ez mîrîm geli zîndîyan
Mîn neveşêrîn weki hemûyan
Gorêd mîn çêkîr bîrîn siha çîyan
Kêlekêd mîn çêkîr jî du kezîyan
Hemî Adaran hûn mîn hişyar kîr
Da bo ku meşînin jî bo me hemûyan"*

Mihemed Şêxo jî, weke daxwaza wi û weke gelek welatparêzên Kurd dî cejnîyan de, kêf û şahîyan de, dî biranîna serhîldanê gelê Kurd de wê bê biranîna. Gora wi li cem Cigerxwîn bû gora duduyan ku gelê me wê van herduyan jî birneke û gorê wan bî gul, sosîn, rîhanan ve bixemline.

Cigerxwîn dî helbestên xwe de çawa rewşa dinê ya gelê Kurd dîyanî zîman, Mihemed Şêxo jî, bî muzîka xwe ya xwerû û babet bî babet derd û kul û halê gelê xwe berbiçav dîkîr. Weke dî straneke xwe de bêkesîya Kurdan nişan dîkîr, bî deng û awazê xwe diqêriya û digot:

*"Ay felek bo te dînalîm
Bo çî nêrgîz çîlmîsîn?
Ew çîma bextê me wa ye
Em bê dost û bê kes îr."
Ew bîlîlê Kurdistanê bû. Ew îro ne li cem*

me ye, lê ew dî dilê me de ye. Stranên wi îro li her çar parçên Kurdistanê û dî nav Kurdan de bî nav û deng îr. Dî şevan de, dawetan de, govend û dilanan de tîn gotîr, dî devê xort û keçên Kurd de ne.

Melodîya hîrî stranên wi, jî aliyê stranbêjên Tîrk ve hatîne dîzîrîn û li Tîrkîyê bî gotîrînê Tîrkî tîn gotîr. (Mêze bike: Kovara Tîrkî, Tempo, Adar-Nîsan, 1989)

Gelê Kurd û xelkê Qamişlo, cenaza Mihemed Şêxo bî awakî nû rakîr. Bî hezaran kes, li ber mala wi û mîzgeftê kom bûn û bî hev re meşîyan heta ser mezela. Wê rojê, kesekî karê xwe nekîr. Xwendekarên xort û keç, dest jî xwendînê berdîrî, karkeran karê xwe berdîrî, jîrî û mêrî û zarok bî hev re jî malên xwe derketîrî hatîrî şîna Mihemed Şêxo kirîrî. Bî heftîrî xort û keçên xwendekar û karker, tîrba Mihemed Şêxo bî gul û kulîlkan xemîlandîrî. Gelê Kurd wê rojê, li ser tîrba wi jî bo rîzgarkîrîna welatê xwe, jî bo azadkîrîna gelê xwe bî hev re sond xwarîrî û gotîrî:

-Bijî Kurd û Kurdistan!
-Namîre, namîre bavê Felek namîre!
-Namîre. namîre Mihemed Şêxo namîre!

27.04.1989

*Nameya jêrin ji aliyê Kemal Burkay va ji Malmisanij û
M. Lewendi ra hatiye şandin. Burkay, ji bo weşandinê
sûretek ji ji Roja Nû ra şandiye.*

Ji Malmisanij û Mahmûd Lewendi ra,

Hevalên hêja,

Kîtêba we ya bî navê "Rojnamegeriya Kurdi" (Lî Kurdîstana Bakûr û Tirkîyê) gîha destê min. Xebateke hêja ye, we piroz dikim.

Min di derheqa "Ezilenler" û "Roja Welat" da hîn xeletî ditin ku dixwazim rast bikim. (Her çiqas êdî dereng e ji, dibe ku piştî, di çapeke nû da bî kar bê).

1- Derheqa "Ezilenler" da hûn dibêjin ku, "lî gor gotîna Ali Gültekin, lî ser berga rojnamê usa hatiye nivisandin: "Organa Weşani ya Mehane ya Partiya Karkerên Tirkîyê-Şûbeyaya Dêrsimê (Tunceli) ye". Lê ev yek xelet e. Di bin sernamê da (ango lî berga rojnamê) bî tirkî usa hatiye nivîsin: "Panzdeh rojî da carê derdikeve, Rojname Sosyalist (Toplumcu)".

Her usa ji, Kemal Burkay him xudî, him ji berpîrsiyar bû. Ne tenê herdu hejmarên pêşin, pîraniya hejmarên wê, ne lî Samsûnê, lî Ordu û Fatsayê çap bûn. Du-sê hejmar lî Diyarbêkêrê, yê dawî ji lî Dêrsim (Tunceli) çap bûn.

Ez, fotokopiya çend hejmaran ji we ra bî rê dikim; temami lî ba min ji tunin.

2- Derheqa Roja Welat da hûn dibêjin ku "Lî Tirkîyê 12 hejmarên wê derketin. Piştî lî Ewrûpa'yê demekê weşana xwe domand."

Lê ew rojnameya ku piştî, lî Ewrûpa bî navê "Roja Welat" derket, tu eleqeyek xwe bî Roja Welat a berê

(ya ku lî Tirkîyê derket) tune ye. Roja Welat ji wek Riya Azadî -dî weşarti da- organeke Partiya Sosyalist a Kurdîstana Tirkîyê bû û eşkere derdiket. Piştî ku di sala 1979'da bî destê idara orfî hat girtin, êdî derneket. Ewê ku lî Ewrûpa bî navê Roja Welat rojname derxistin, kîrîna wan korsaniyek bû. Yê ku bî siyaseta Kurdîstana Tirkîyê mijûl in baş dîzanin, ew hîn kes bûn ku ji partiyê hatî bûn avêtin; tu heqê wan tune bû ku vi navî bî kar binin. Ji xwe, bî aliyê nivîskarên xwe û bî naverok, siyaseta û tesîrî ji, -jî navbêr- di navbera herduwan da tu eleqê tune. Roja Welat, lî welat, di dest partiyê da şerê kolonyalîstan dikir. Lê wan kesana, lî Ewrûpa xwestin bî vi navê delal şerê partiyê bikin. Lê kesî guh neda wan û bî xwe ji bêzar bûn, dev jê berdan.

Disa hûn, gor gotîna Sîddîk Bozarslan dibêjin ku Roja Welat lî Tirkîyê navbera 7000 û 10.000 nusxeyan da hatiye çapkirin. Ew ji xelet e. Hejmara Roja Welat a pêşin 20.000 nusxe çap bû. Ji ber ku têrê nekir, ya duwemin 30.000 çap bû. Hejmarên dinê jî 30.000'i daneketin. Yek-du hejmarên wê jî 40.000 bûn.

Sîddîk Bozarslan tenê berpîrsiyarê hejmara pêşin bû, lê xuyaye, haya wî jî vê hejmarê ji tune, an jî bira wî çûye.

Silav dikim û serfiraziya we dixwazim.

**22 Nisan 1989
Kemal Burkay**

ÇEND ÇARÛN

BARAN

Merivtiyê bî qenci, jiyana xwe bî kar bîpive
Kalek jir cıwan e û teralek xort bî rasti kal e
Emrê gulan çend roj in û dar salê carê ber dıdın
Va te heftê sal emr kır, ka fêkiyên te?

Sêvşekır tev hate xwarın, jı te ra tenê ev dar maye
Leşkerê gıran hemi çû, tenê ev qumandar maye
Emr wek baranên biharê hat û çû
Jı wê hay û hûyê tenê ev hawar maye

Delalê te lı xaliçê xıst rengê zevi û zozanan
Dengê avê ye, ya ba û baranê lı bılûra şıvan
Hozan dı şîrên xwe da jıyanê dınexşının
Hozan dımırın lê şîr dıjin heyra sedsalan

Rûken û hêvidar wek aşiti yi
Wek roja havinê, ba û şinkayi
Kılam hatın çûn, çıvik û zeman
Dost û heval i, wek bêdengi yi

Bındest jı ço dıtırsın, zordest jı gotın û raman
Dengê kewê lı zınaran xweş e, bihna kulilkan lı çolan
Pûlperest pûlan komdıke, malperest mal û zevi
Lê jı vır û bihûştê ne tırên heye, ne karwan

Tu ne marksist i, markist i, kronist i, dolarist i
Lı ber destê te ava sar û germ, otoyaya nerm, konformist i
Te zû jı bir kır birçiti, zulm û zindan, heval û hogır
Qe nebe dengê xwe bıbir, hım bêbext û sıst i, hım pıste-pıst i

HEME SEIDÊ HESEN

Fexredin GERDÎ

Lı sala 1950 da lı navça Qeredax nêziki bajarê Sulêmani hatiye dinyayê. Lı dawiya salên 1960'an da dest bı nıvisin û şîir kırıye û berhemên wi di rojname û kovarên Kurdi da, lı Kurdıstana Başûr belav bûne. Herweha lı festivala yekemin ya zarokên Kurd lı Kurdıstana başûr beşdar bûye.

Jı sala 1980 heta 1982 endamê komita karger ya Yekitiya Nıviskarên Kurd-lıqê Sulêmani û herweha demekê ji endamê komita karger ya malbenda gışti bûye.

Dı sala 1983'an dafermana gırtına wi hat ji hukumeta Iraqê. Jı ber ku şa'irê me dı cıvineke nıviskarên Kurd da beşdar bûbû lı Iraqê û lı dji karên rejıma Iraqê rawestabû. Vêca ew neçar bûbû ku xwe bıgihine nav hêzên şoreşa tevgera gelê Kurd lı Kurdıstana başûr.

JI Belavkirinên Şa'irê Me

1) Diwanên şa'ir:


1- "Tavge û bınar", 1978, Çapxana Ela-Bexda. 2- "Şepûli Şeqam", 1987, Çapxana Alqaide. 3- "Semai Gulale Sor e", 1987, çapi yekem "Çapxana Alayı Şoreş", çapi duwem "Binkey Hengaw" Stockholm-Swêd. 4- "Helepçe Xezey Xemnake", 1988, Ç. Kitêbxana Sara, Stockholm.

2) Rexne û lêkolin:

1- "Wişekan Degerênwe Medari Xuyan", 1979, Ç.Ela-Bexda. 2- "Şır Helwêste", Ç. Reperin, Sulêmani. 3- "Yekiti Noserani Kurd Çı Bı Ser Hat?", 1983, beşi yekem "Çapxaney Şehid İbrahim Ezo", beşi duwem 1985 "Çapxaney Elqaide". 4- "Pêşkiyekî dırêj bo komelê çiroki Kurd", 1988, Çapxana Alay Şoreş.

3) Be's

1- "Afret lı çiroki Kurdi da û komelek pırs", lı govare Noseri Kurd çap bûye. 2- "Ewi bıdrewşetewe merc niye zêrbıt", lı govare Noseri Kurd. 3- "Palewan û rûdaw lı çiroki Kurdi da", govare Karwan. 4- "Ew şaireney çirok dımasın", govare Beyan. 5- "Şorbûnewe benaxi komele şıri jıwan da", govare Gızıng; û eve çend parçe şır ji



diwana "Semi Gulale Sor e" û diwana "Helepçe xeze xemnake" pêşkêşî xwendevanên Roja Nû dikim.

ŞER

"Şeytan û Xuwa

Şeryane

Gorepani şerekeyan

Naxi dili insane." (1)

Sermaye û kar

Beste û robar

Prolitariya û burjuwa

Şeryane

Gorepani şerekeyan

Seranserî cihane

Sopayi holakoyi serdem azadixwa

Şeryane

Gorepani şerekeyan

Kurdıstani wêrane.

1985

LI KUYÎ LİNİN

Bê to cihan

Zilkawêke pan û berin

To bo êstam pêwıstırî

Lı hewayi pak

Lı awi rûn

Lı tişkî hetawi zêrin

Esta bê to

Lı awi rûn
Lı tişki hetawi zêrin
Esta bê to
Mılwankeyeki pıçrawem
Lı kûyi, bêyi, bım honiyewe?
Lı kûyi ta ku bım keyewe,
Gerdeni bılindi şirin?
Lı kûyi Linin?

1986

ÇEND LAPEREYEK LI DEFTERİ DIL

Şûr çi ye?
Guli bax e.
Hesti nax e.
Giriwey meli şeydaye.
Çeki şani pêşmerge ye.
Xermaney mangi burwa ye.

Şair çi ye?
Gulfiroş e.
Dildareke be wefa ye.
Cengawereki tenya ye.
Yan duwa pêxemberi xuda ye.

LAPERİ PENCEM

Bo geyiştın be mebeste gilawekey
Nuqmi zilkawi kirdewe,
Kılawekey.
Disanewe burjuwayi Kurd
Rêgayi xoşkird
Tacê desti dirindekan
Zeqtır diyar bê
Ta jumarey şehidekan
Lı rojêka,
Hêndey gelayi deyan dar bê.
Ke serxoşê derjêtewe
Reftari burjuwayi Kurd um bir dêtewe.
De sal ber lı êsta wıtım
Helepçe xezey xem nake
Sed bırya her xeze buwaye
Hiroşimaye êstake.
Ey Helepçe!
Ke debite mêwani azizi birım,
Ke be naxi yadi caran deçımewe,
Wek simor e
Be hemû dirextekani kanêşkan e heldegerên.
Eme çırpey lêwi dılm e,
Guyê bıgre lêm...
Ta le to dūr bikewmewe,
Le mirdın nızik debımewe.

Nisani 1988

Kurdistan, qelayi sexti xuragirtın
Kurdistan, berbesti lafawi mirdın
Kurdistan, Kurdıstani sertape gur
Kurdistan deryayi xênawi bê bın
Kurdistan, girdi seywan hawareke
Newi to silnaketewe le kuştın
Kurdistan, pêti hemû sêdarekan
Gerdeni bılindi rolet enasın
Kurdistan be darıstani şımşêre
Hengaw enêy berew lotkey serkewtın.

1981

ÇEND PIRSYAREKÉ ASAN

Kam wılat e,
Wek Kurdistan,
Rengin e?
Kam şair e
Wek Goran zarşirin e?
Awi kanyawi kam dever,
Wek awi kani Kurdistan
Rewan e?
Dayiki kam gel,
Wek dayiki Kurd,
Dılsoz û muhreban e?
Befri kûye wek,
Befri Asos,
Xawên e?
Kam afret wek,
Jinê Kurd pak dawên e?
Kam dıldar e,
Ewındey Mem, cıwamêr e?
Kam qareman,
Wek pêşmerge dılêr e?
Kam zıman e,
Hêndey Kurdi,
Dewlemend e?
Mindali kûye,
Wek mindali Kurdistan,
Jikeleye û lêw be xende?
Kırêkari kam wılat e,
Wekû prolitariyayi Kurd,
Bo raperin,
Be perûşe?
Burjuwayi kam neteweye,
Niw ewındey burjuwayi Kurd,
Gerdenkeç û xwefiroş e.

11 Temoz 1988

FERHENGOK

gorepani : meydana şer (meydan).
naxi : hundur.
zilkaw : cıha pis, çemê qılêr.
pak : paqij.
tişk : ronahiya tavê.

çiriwe : dengê bulbul.

mel : teyr, çivik, çûk.

şeyda : şêt, din.

dildar : evindar

nuqm : qamkırına avê, noq.

gılawe : Pisiti.

zeqtır : firehtır.

gelay : belgê darê; pelê darê.

reftar : exlaq.

sımore : Sıhor.

kanêşqan : navê taxekê li Helepçe.

guyê bigre lêm : min guhdari bike.

xuragirtım : xwegirti.

lafaw : Feyezang, avrabûn; lehi, naser.

berbest : asteng.

sertape : seranser.

gır : hulma agir.

gırd : gır, serê milê (coxrafi).

seywan : girekê li bajarê Sulêmaniyê ku bûye qebristan.

newi : netewe.

sılaketewe : nazivire, venagere.

peti : weris.

hingaw enêy : pêngav avêtın.

lotkey : serê çiya,

Asos : navê çiyayekê li Kurdîstana Başûr.

afret : jin.

dawên : rêk û pêk.

hêndey : bî qasi, hındê.

jikele : nazık, xweşik.

xende : bî ken.

perûş : amade.

gerdenkeç : serşor, mulsar, serbejêr.

Dı jiyana rewşenbiri û siyasi a Kurdan da rojeke piroz:

22'Ê NİSANÊ

ROJA ROJNAMEGERIYA KURDI

Çawa tê zanin rojnameya Kurdi ya pêşin "Kurdîstan", di 22'ê Nisana 1898' an da, li Qahirê, ji aliyê M. Midhet Bedirxan va hatibû derxistin.

Bî derketina "Kurdîstanê" ra, zımanê Kurdi derkete meydana pexşanê (nesir) û rojnamegeriyê. Ew rojnameyeke siyasi û çandî bû. Dıgel zımanê Kurdi carna bî zımanê Osmani ji bend hatine nıvisandin. "Kurdîstan" heta sala 1902'yan jiyana xwe domandiye û li ser hev 31 hejmarên wê derketine.

22'ê Nisanê, roja derketina rojnameya me ya heri pêşin e û lema ji ew di jiyana rewşenbiri û siyasi a gelê me da bûye rojeke piroz. Van salên dawin li Kurdîstana Iraqê, 22'ê Nisanê wek roja



rojnamegeriya Kurdi tê pirozkirin, û her diçe ev roj, wek cejneke netewî li seranserî Kurdîstanê tê pejrandin û pirozkirin.

Kurdên Gurcistanê

Sala 1918 pareke Kurdên Sovyet, angu Kurdên Êzidi, li Tirkîyê ji ber qetla Romê dîrevîn û tîna Gurcistanê, ciwar dibin. Nuha li Gurcistanê Sovyet da nêzîki 30 hezar Kurd dijîn.

Ji sedsalan vîrda, Kurd ji xwendin û ronahiyê bêpar mabûn; tenê şoreşa "Oktoberê a mezin, bi derbaskirina siyaseta "Leninizm" a mîleti, mecal da hemû mîletan û Kurdan bona pêşveçûyina wan a abori, civaki û çandî.

Iro li vir, angu li Gurcistanê, parti û hukumeta Gurcistanê guhdariyek mezin daye koma gelê Kurd. Dî vê dema kurt da, bona karê birêvebiri û ramanê, her usa ji bona çand û ronahiya wan sê (3) biryaran giring qebûl kir.

Sala 1974, 1978, 1980 an da li nav Kurdan karê siyasî bi taybetî gurr û geş bû, mîletê Kurd ji kete vi karê politik û civaki.

Ji Bona Kurdan Çi Hatiye Kirin û Tê kirin?

Iro di nav Yekitiya Nivîskarên Gurcistan da, beşek ji beşa yekitiya nivîskarên Kurd e. Dî aliyê din da, isal dehsaliya sazîkirin û weşandina Radyoya Zîmanê Kurdî temam dibe. Disa li nav Yekitiya Nûçevanên Gurcistanê da gelek nûçevanên Kurd û rojnamevanên Kurd, angu jûrnalist ji hene. Her usa di van salên berî da jûmara endamên Partiya Komünist zêde dibin û li nav van endamên Partiya Bolşevik da gelek komünistên Kurd ji hene.

Dî sala 1988'an da, di hîlbiyartina hukumeta Gurcistanê da sê (3) kesên Kurd ji ketin nav xebatên partiyê û Komara Gurcistanê.

Cûdayî di kongra Partiya Bolşevik a 27 da û konferansa 19'an da nûnerê Kurd ji hate ditin. Navê nûnerê Kurd "MAMREŞ" e.

Li ba van tiştên qenc, sal bi sal li Gur-

cistanê û di temamiya Yekitiya Sovyet da ronakbir û entelektuelên Kurd zêde dibin. Komara Gurcistanê, bi navê Kurdên ilmdar, bijîjk (doktor), encinêr (muhendis), karmendên cûre cûre kubar û serbilind dibe. Ji wan wek Luisa ALOÛVA (bijîjkê biyolojiyê), Lamara PAŞAEV (bijîjkê dirok û etnografiyê), Mahmûd KALOEV (bijîjkê fizikê), Kerem ANQOS û yên din.

Li bajarê Tîblîsê da Koma Reqas û Govenda Kurdî, Koma Reqasa Zarokan, Koma Şano (tiyatro) a Kurdî, Komsomola Cîwanên Kurd gelek karên heja dikin. Disa di bajarê Tîblîsê da, ji bona hozan û helbestvanên Kurd salê 5 - 6 şevên civaki çêdibin; hozan û helbestvanê Kurd, di van şevan da helbestên xwe û yên biyanîyan dixwinin. Li aliyê din, li Gurcistanê filmek ji li ser jina Kurdan çêbûye, navê vê filmê "Em Kurd in".

Ji sala 1987'an vîrda, bi biryara Wezîrê Perwerdegariya Gurcistanê li heşt (8) dibistanên Gurcistanê ji bona zarokên Kurdan, dersên zîmanê Kurdî tene derbazîrin; her usa ji komelek mamosteyê Kurdan bi resmî vebûye. Ev komele kareki gelek giring daye ser milê xwe ji bona zarokên Kurd, ku zarok çand, dirok û edebiyata Kurdî zanibin û wînda nekî, fêrî her tiştê qenc bînin.

Isal (1988) komelek çandî bi navê "Ahmedê XANÎ" hatiye damezrandin. Kar û barên komelê û armanca komelê ew e ku, li ser zîman, çand, dirok û edebiyata Kurdî bi taybetî xebat bike.

Gulvedan û pêşveçûyina Kurdên Gurcistanê û yên Yekitiya Sovyet, îspatiya vê yekê dike ku, weki Partiya Komünist, bi saya siyaseta Leninizma mîleti, guhdariyek mezin dide ser pêşveçûyina mîletên piçûk û yên din.

Her Biji Leninizm!
Her Biji Kurdistan!

LEYLA ÇILDERGÛŞI

JÎ DÎROKA KURDISTANÊ

Jî Gernama
EWLIYA ÇELEBÎ

Werger: DILSOZ



KELA WANÊ


Dî xakê Azerbeycanê da, deryaya Wanê dikeve başûr, rojava û bakûrê Kela Wanê; alî rojhilat û stêrk wek baxçê cenneta derewin e û orta beriyêke mezin e ku, Kela Wanê di orta vê beriyê da wek deveyekî ku di bin bar da ketibe tê xuyan û paştya wê gihîştîye asiman. Dî rengekî pembe û nexşa bûkelamûn da ye û zinarêke temaşekirîne ye. Herdu aliyê wê wek barê devê zîk daye û fireh e; di binê wê da zinarên vala yê çiyayê bêstûn heye. Binê zinarên alî qiblê, jêra bajêr e û sinorê sûrên nîzîm e. Lê li cihê zînara ku binê wê vala ye û li bakûr dikeve, angû cihê ku Timûr lê erd ajotîye bajar tune. Alîkî wê avzêla bî zîlek e. Aliyê rojava erdê Timûr e, dawîya wê jî berî ye.

Ev zinarê han wek deveyê rûniştî ye, serê wê li alî rojhilat dimihêre; bî navê Kevirê birî (Kesikkaya) yan jî Stuyê devê (Deveboynu) tê naskirin û wek gulleya topên dirêj latên wê hene. Lê çiyayên nîzîm û dawîya vê zinarê -ku qûna wê wek deve tê xuyan- li alî deryaya Wanê, li rojava dimihêre. Mîrov, li vê cihê ku dirûvê qûna devê pê dikeve, 3060 gav berbî jor, di ser zînarên da û bî tirs tam saetek hûldîkşê; jî heft qûle û heft derîyan derbas dibe û di gihîje Derê Arapcan ê jêrê

ku, diwarê kelê yê herî nîzîm û latên wê bî şîklekî ecêb tî xuyan; li gelek cihên wê zînarê wek ejderha hene ku, berbî jêr daketîne û pêşîya bajêr digrin, serê wan, pencên wan û gerdena wan aşkera ne, eger mîrov baş bala xwe bîdê jî hev ferq dike. Gelek jê di şîklê şêr, tîmsah û keştî da ne. Hinek jî wan zînarên dişîbin teyrê Uqab ê rûniştî. Ev zînarên han tam di sê saetan da tê gerin.

Dî nava vê kelê da, qat bî qat tam şeşsed (600) şîkeftên mezin hene ku, her yek jî wan wek kerwanseray in. Dî gelek şîkeftan da odayên bî dezge hene ku, têda şagirt û hostayên wan îbrîşîm, ta, bendê topan badîdîn.

Dî sedan şîkeftan da, gulleyê topan li ser hev in ku hesabê wan Xwedê dîzane. Gelek jê jî, bî barûta reş dagirtî ne. Dî gelek an da tîr û kevan, zemberek, tîving, şûr, mertal, bîvîr, tevîr, kuling, bîr, qumbere, çerxa felek, çaparîz, piyên beraz, mencenîq, kevîrên gîlover û wd. bê hed û hesab cebîlxane û tîştên pêwîst hene. Hetta, bî taybetî di sed şîkeftî da ceh, genîm, birincê bî çîltûk, garîs, baqîl, nîsk, nok û wd. hene. Dî şîkeftêkî da jî, tenê hestiyê heywanan ketîye ser hev. Dî yeke dîn da jî, solên kevn, çarox û wd.



tiştên bê mane -ku bermayiyên hezar salan bûn- tiji ye. Dî şikeftêki da, dî sarınceki da (jî gelek sarıncan) rûnê tovê keten, dî yeki da rûnê kuncî, dî yeki da donê mûm, dî yeki da rûnê zer, dî yeki da qetran, dî yeki da zift û wd. cûre cûre rûn hene.

Pûrta dewaran (çêlek, ga û wd) û mûyê çermê gamêşan ruhandine û wan çerman zûl-zûli, parçe-parçe kirine û heft hewzan pê dagirtine; heta ber devê hewzan hungiv rêtine ser wan; paşê jî wan çermê dewar û gamêşan tu elamet nemaye û cûreyek riçala xweş çêbûye ku, mirov jî xwarina wê têr nabe.

Dî şikeftêki da masiyên xwêkiri, dî şikeftêki da goştê xwêkiri yê dewar, gamêş, mih û bızinan û dî sê şikeftan da seranser xwê, dî şikeftêki da nanê garis ê patî, peksimet, ar û savar tiji ye ku hesabê wan her Xwedê dizane.

Dî gelek hewzan da sirke, hungiv, penir, zeyt û hetta şeraba bêşermiyê heye ku, ew şerab yan jî bo çêkirina derman tê bî kar anin yan jî dîdîn filehên ku dî bîn hesarê da nîn û bacê dîdîn. Hetta dî şikeftêki da bî fermana Xwedê madena neftê heye ku, jî zinar dertê û dirije hewzeki mezin. Gava hewzê tiji dibe, bî selahiyeta dewletê, defterdarê Wanê wê neftê difroşe bazirganên. Lê ev şikeft, bî şev û roj girtiye û tê parastin. Xwedê nişan nede, eger agir bîkevê, bî axê tê temirandin.

Bî kurti dî wê zınara Wanê (Kela Wanê) da bî qasi şesşed şikeft hene ku, tu yek jî wan vala nine. Hemû bî cebîlxane, çek

(silah) û tiştên pêwîst dagirti ne. Hetta Suleyman Xan, gelek keleh fetih kirine û bî fetihkirina kelehan dî derheqa her tiştî da agahdari bî dest xîstiyê; hesabê topên ku jî dervayî kelê û jî kelê tîn avêtin û van topan wê çawa zîrarê bide dijmin kiriyê; lî serê Kela Wanê, cihê herî bilind bî bist, sih, çil bihust navbera wan da top bî cih kirine, dema ku jî qonaxa çar saetan, jî rezên Edremîtê dijmin bête xuyan ev topên han dî beriya Wanê û çil milê (400 km) deryaya wê da mirov nade livandin. Eger dijmin bî listik xwe bîgihine bînya kelê, gulleyê topên serê kelê isabetê dijmin nake û lî cihê dîr dixê. Jî ber vê yekê Suleyman Xanê mezin, vi tiştê hanê jî fikiriye û dî gelek şikeftan da qulê topan yê wê zikê kalyonan vekiriye, dî her şikeftêki da bî zehmeti û dijwari cûreyek top bî cih kiriyê ku, gava mirov dibine şaş û metal dîmine, tiliyên xwe gez dîke.

Her weha, wek jûji rêzek top rêz kiriyê, hemû gulle û lazmatiyên wan hazır kiriyê û lî rex topan daniye. Dî şikeftên bîni da bî qasi şuna miroveki, cih hatiye çêkirin û topên Şayka yê keviravêj hatine bî rêz kirin; piştî wê lî ser deri, diwar û bircên kela jêrin: Jî derê Yalî heta qûleya Paşa û jî Wê derê heta digihije qûleyên Husrevpaşa, Derê Navin, Velet û Tebrizê yek qat top hatine bî rêz kirin ku, bî vi hesabî Kela Wanê wek kalyon lî çep û rastê wê çar qat top hatine bî cih kirin.

(Gername, Cild: 4, rûpel: 165 - 168)

BABA TAHİR URYANÎ

Ki ye û çî dibêje?

Baba Tahîr Uryani şaireki Kurd e, dî navbera sedsalên 9 û 10' an da jiyaye. Xelkê bajarê Hemedanê ye û lema jêra Baba Tahîrê Hemedani ji tê gotin. Ev helbestvanê Kurd, Kurdekî Lori ye. Ewî helbestên xwe bi kurdîya lori û bi zîmanê farîsî nivîsîne.

Bi gotîna edebiyatzan û pîsporên edebiyata Farîsî, Baba Tahîr 387 çarin nivîsîne. Her wîsa dibêjin Babatahîr çarinçêkirê pêşîn e. Çarinên Babatahîr li ser du bîngêhên dengî pêk hatîne: a) Keşa kurt, b) Keşa dirêj û fireh.

Baba Tahîr Uryani, dî sala 935 (miladî) da li bajarê Hemedanê hatiye dinyayê û dî sala 1010' an da çûye ser heqîya xwe. Ev şairê Kurdê Lori her li vi bejari hatiye gorkirin, niha jî, ji cihê qebrê wî ra dibêjin "Bînbazare", her dî wê dewrê da turbeyek li ser gora wî hatiye çêkirin. Lê niha ku gelekî zeman dî sera çûye, dî serhev da herîfiye û wek xîrabeyekî lê-hatiye.

Çarinên Babatahîr URYANÎ, dîkarîm bêjîm eger xwe Kurdê Lori neba, Farîsî bûya, niha ewê jî wek Sadûn, Hafîz Şîrazî û gelek şairên klasîk ên Îranî bi nav û deng bûya. Lê şovenîzma Farîsî, jî zaravê Lori acîz e, herçend dî hînek cihan da diêxin ber behsê û jê dixafîjn jî.. Ew jî dîsan jî ber ku wî hîndek çarinên xwe bi zîmanê Farîsî nivîsîne. Peyva "URYANÎ" Farîsî ye, tê mana "rût û tazi".

Dî wî zemanî da hemî helbestvanan, helbestên xwe li ser jîna mir, şah û padişahan vehunane, lê wî li ser dijwariyên jîyanê, li ser feqîriyê û hwd. nivîsiye. Dî wê serdemê da, pîraniya şairan gelek feqîr jî nebûn, jî ber vê çendê pîrsek tê pêş "erê gelo Babatahîr kesekî pîr xîzan bûye?". Ew dî vê çarîna xwe da dibêje:

.....
*"Ewê bê mal û saman min im
Ewê aware û bê nan min im
Ewê şew bê şîw rojê dîke min im
Min im rojreşî nemane min im"*

Helbestvan dî vê çarîna xwe da dîde xuyan, ku ew dî nav nebûnê û dî nav jarî û feqîriyê da jiyaye. Gelek şevên xwe bê şîv û xwarîn gîhandîye rojê. Dî vi halî da, dişa jî jî jîyanê hez dî-ke; naxwaze bîmre û bîçite nav dîn-ya dîn. Lê herweha dî bendên wî da wîsa tê ber çavan, ku bawerîyeke xwe bi jîna dînya dîn nine. Dibêje:

.....
*"Carê rêm kewte naw goristanê
Hat guêm dengî be kul gîyanê
Dîm îsqîneki le xak elêt
Xoşî û lezeta ser dînya kuûne?"*

.....
Şair dibêje, carekê ez çûme nav goristanê, min bîhist dengê şîv û girînê dihat. Min dît hestîyek dî nav axê ra dibêje: "kanê lezet û xweşîya ser dinyayê?". Dî pîraniya çarinên şair da, hewar û gaziya jî destê êş û jan û

nexweşiyên jinê û evina dilê şî-kesti
tê pêş. Dibêje:

*"Skaleyî eşîn û azarim heta kêy
Perişani rojgar im heta kêy
Bebariki bixe bari granim...
Bo bes bê etir hewarim heta kêy"*

Şair dibêje gazinde û lome, êş û ja-
nên min hetani kengi, perişani û ja-
riya min heta kengi, bes êdi ev hewa-
ra min heta kengi?!..

Şair jî ber ferqî û newekheviya
navbera qata serdest û qata bîndest
gazında jî Xwedê dike û dibêje:

*"Eger destim egîhişte tû xwaye
Lêm epirsit ke em jine bo weye
Yekê mest e le gel yari be şadi
Yekê bîrsi bo nani mîbtlaye"*

Dibêje, Xwedê eger destê min gîhiş-
tîba te, min ê jî te pîrsiba ka ev jine
çima wisa ye. Bo hinek tîr in û keyfê
dikin, hinek jî muhtaci nanê hişk û
rojane ne? Bî vi awayî şair, pîrsên
civaki yê wê serdemê, li gor zanin û
têgîhiştina xwe rîjandiye ser kaxizê.
Jî bilî girîhişkên çivaki, bêtir li ser

aşiqî û maşiqiyê, evin û dildariyê
nivisiye. Derdê dildariyê jî hemî
jan û eşên civaki grantir e. Dî hel-
besteke xwe da weha dibêje:

*Sê derdi zor granim le bê bûn bar
Xeribi û esiri û xemi yar.
Xeribi û esiri giring nîn,
Xemi yarim granê bom bîkîn
çar.*

Şair dibêje sê derd li min bûne
bar, xeribi, esiri û xema yarê. Dibê-
je xeribi û esiri bo min muhum ni-
ne, lê derdê yarê û kula dilê min
gran e.

Çawa mamosta Eladdin Secadi di
"Mêjûy Edebi Kurdî" da dîde xuyan
Baba Tahîr şairekî Kurd e. Herweha
Dr. Qasimlo di pirtûka "Kurd û
Kurdistan" da dibêje ku ew şairekî
Kurd e. Lê heyf û mîxabîna derheqa vi
şairî da materiyalên agahdariyê
kêm in, dibe ku gelek bîn jî, lê ez jê
bêxeber im.

15.1. 1989
Pêşmergeyek li Kurdistanê Îranê
N. REŞO

*Hevalên heja destê nîwîskarên Roja Nû
silav!*

*Hevalên berkevtî, ez pêşmergeyekî gelê me, niha li Kurdistanê Îranê, di nav
şerê çekdari da xebata şoreşvaniya xwe dikim. Min hewce zani ez çend hevo-
kan li ser şairê Kurd Baba Tahîr URYANÎ, bo kovara we binivîsim. Pêwîst e
evê jî bêjim, ez ne şair im, ne jî pîzan an jî lêkolivanekî edebî me, lê wek
Kurdekî welatparêz dixwazim harikariya we hevalên heja bikim. Min
xwast ku, ez bişîm berekî (kevîrekî) danîme ser wî diwarê ku hûn dihînin.*

Hevalno!

*Xebata me pîralî ye. Em diwê di hemî çeperan da li hember dijminên Kurd û
Kurdistanê şer bikin. Xebata hûn dikin gelekî heja ye. Hekî bî hevra
gîrêdayî ne, û yek şûna ê din nagre. Her herf û peyvek, her stran û meqamekî
gelê me, wek fişengekî ye ku jî lûleya çekên pêşmerge derdikeve û li ser singê
dijmin dikeve. Dijmin dixwaze zimanê me, çand, edeb û diroka me, bîtax
bîke, li paş bihêle û yekser li me bike biyani. Her jî ber vê çendê ye xebata we
"Roja Nû" pîr biha û heja ye. Serfraz bin!*

*Bî hêviya serkevtina gelê me û rêvingên rêka Azadiyê, digel rêz û silavên
xwe.*

N. Reşo
Xwendevanekî kovara we li Kurdistanê Îranê.

KONFERANSA NAVNETEWÎ YA “MAFÊN MIROVATÎ LI KURDISTANÊ” PÊKHAT

Dî 14-16 Nisan 1989'an da li Elmanya Federal bajarê Bremenê bi navê “**Mafên Mirovati Li Kurdistanê**” konferansê navnetewî pêk hat. Konferans, bi destê “**Însiyatîfa Mafên Mirovati Li Kurdistanê**” hatibû amadekirin.

Ji 16 welatan, kesên politik, ulîmdar, rojnemeyan, nivîskar, hunermend û gelek kesên din li Konferansê beşdar bûn. Li ser rewşa gelê Kurd bi her awayî dur û dirêj hat axiftin. 50 rapor û tez, bi destê van kesan hat pêşkêş kirin. Daxuyaniya Konferansê bi destê 55 kesên bi nav û deng hatibû imzakerin û her aliyê dinyayê hat belavkirin. Her weha di sa nêzikê 1000 kes û rêxistinên netewî û navnetewî jî bi imzên xwe ve piştgirîya xwe bi Konferansê ve nîşan dan.

Bi navê “**Însiyatîfa Mafên Mirovati Li Kurdistanê**” Sertaç Bucak û Rektora Politeknîk ya Bremenê Ronald Mönch axiftin û konferans dest bi karên xwe kir. Paşê parlamena Partiya Sosyal Demokrat (SPD) Rudolf Bindig, Wezirê Edlayî ya Bremenê Völker Kröning, parlamenê Swêd ya Partiya Komünist a Çep Berit Ericksson axiftin.

Serokê Parlamentoya Bremenê **Dieter Klink**, Konferansê hildabû bin baskên xwe. Klink, qebûlnekirina hebûna gelê Kurd, di 40 saliya Daxuyaniya Mafên Mirovati ya Yekitiya Milletan wek skandal bi nav kir.

Wezirê Edlayî ya Parlamena Bremenê **Völker Kröning** di axiftina xwe zulum û zordestiya dewleta Tirk hember gelê Kurd, gor peymanên Helsinki û Yekitiya Milletan anî ber çavan. Û got, “bi van kirinên xwe ve dewleta Tirk, wan peymanan hildide bin lîngan.”

Dî beşa nasandina Konferansê da, parlamenterê Partiya Keskan **Petra K. Kelly**, jî ber nexweşbûna xwe dereng hate cihê Konferansê. Petra K. Kelly, axiftina xwe da zêtir li ser jiyana gelê Kurd yê bi zehmet û xebitandina çekên kimyewî hember gelê Kurd sekini. Ew, carek dinê li ser berpîrsiyariya dewletên Rojava sekini; jî wan daxwaz kir ku,



Internationale Konferenz
Menschenrechte in Kurdistan

14.-16. April 1989
Hochschule Bremen

Initiative: Menschenrechte in Kurdistan, P.O. Box 10333, D-2800 Bremen, Tel. 0421/703932

International Conference
Human Rights in Kurdistan

Bî axiftina Sertaç Bucak Konferans dest bi kar kir

alîkariya aborî û leşkerî nedine Tirkiyê, Îranê û Iraqê.

Wezirê Din û Perwerdeyî ya Yewnanistan, **Antonis Tritsis**, jî ber hindêk sedeman nekari di Konferansê da beşdar bibe. Ew, telgrafek şandibû Konferansê; jê ra serketin daxwaz dikir.

Karê Konferansê roja duduyan di 4 gruban da berdewam kir.

Gruba I'an da: Li ser “Çanda Kurdi û Mafê mirovati”, gruba II'an da:

“Parastina Jiyan û Şahnazî”, gruba III'an da: Rêxistinên Navnetewî, Peymanên Navnetewî û Kurd”, gruba IV'an “Multeciyên ku ji Iraqê Hatine Tirkiyê” hat axiftin.


Berpîrsiyariya gruba I'an jî Universita Bremenê **Prof. Dr. Antje Katrin-Menk**, yê gruba II'an Tübingenê **Avuqat Bodo Büchner**, yê gruba III'an jî Danimarkayê parlamenter **Pelle Voigt**, yê gruba IV'an jî jî Medico International **Hans Brandscheidt** kir.

Dî gruban da li ser wan tiştan da hat axiftin û tez hatin amadekirin:

Gruba I'an: “**Çanda Kurdi û Hebûna Wî**”, Dr. J. Meyer Ingwersen, Universita Essen; “**Edebiyata Kurdi I**” Ferhad Şhakely, Universita Uppsala-Swêd; “**Edebiyata Kurdi II**” Hüseyin Erdem, PEN'a Kurdi; “**Mafên Mirovati ya Linguistik û Zmanê Kurdi**”, Dr. Phil. Tove Skutnabb-Kangas, Prof. Robert Phillipson (Universita Roskilde, Danimarqa); “**Zagona Qedexkirina Zman**”, Christian Rumpf, Enstituta Max-Plank, Heidelberg; “**Mafê Xebirgirtinê û Kurd**”, Dr. Mirella Galletti, Bologna/Îtalya; panel: “**Zordestiya Çandî Hember Kurdan û Mafê Perwerdeyî**”, rêvebir, Prof. Antje Katrin-Menk.

Gruba II'an: “**Operasyonên Leşkerî li Kurdistan-Büyêrek Piştî 1980'an ? Hêjandinek Dîroki**”, rojnemeyan û nivîskar, Jürgen Roth; “**Rewşa Girtiyên Politik û Eşkenceya Sistemi**”, Herbert Klein, Bielefeld; “**Ji İdara Orfî Valitiya Navçe a Rewşa Giran' Nêrinek Dîroki**” Avuqat Hans Werner Oden-dahl, Köln; “**Sirgun: Zagona Tunceli**” Ute Baran, Berlina Rojava; “**Jinên Kurd û Hebûna Nete-wî**”, Dr. Lale Yalçın-Heckmann, Nurnberg; “**Zagona Cezayê ya Tirkiyê û Kurd**” Av. Ali Bucak, Paris.

Gruba III'an: **New York-Times-Kurdish Times- Li Çapgeriya USA Pîrsa Kurdi**”, Vera Beaudin Saaded-pour; “**Kurd û Li Ewropayê Aktîvîta Mafê Mirovati**” Feliks J. Bister, Cihgirtê Liga Mafên Mirovati ya Avusturya; “**Pîrsa Kurdi û Parlamenta Ewropayê**” Wolfgang von



Nostitz, Munchen; **"Dı Peymana Helsinki ya 1975'an da Mafê Mirovati û Kurd"** Pelle Voigt, Endamê Parlamena Danimarka; **"Mafê Çarenûsi û Kurd"** Sertaç Bucak, Koln; **"Pırsa Kurdi û Koma Milletan"**, Huseyn Sado, Paris.

Gruba IV'an: **"Ji Destpêka Şerê İnan û İraqê Vırda Geşbûna Pırsa Kurdi"** Dr. Ferhad İbrahim, Frei Universite, Berlina Rojava; **"Winda-bûna 8 Hezar Kurdên Barzani"** Hışyar Zıbari, Kurdistanê İraq; **"Peymana Cenevrê ya sala 1925'an û Bıkaranina Çekên Kim-yewi Hember Kurdan"** Prof. Aubin Heyndrickx, Universita Gent-Belçika.

Her weha li ser **"GAP-Proja Pêş-tabına Anatoliya Bakur"** konferansê bî destê Dr. Erhard Franz, Enstituya Orient, Hamburg hat amadekirin.

Disa li ser **"Multeciyên Kurdistanê İraqê yê ku Hatine Tirkîyê"** bî beşdarbûna Heidi Alm-merk, Hannes Kempmann, (Parlamentêrên Niedersachsen, E. Federal); Sabine Baun, rojnamevan-nivîskar, Hannover; Berit Ericksson, parlamenter, Stockholm, Swêd; Barbara Noack, Paul Tiefenbach (Parlamentêrên Bremen, Elmanya Federal) pêk hat.

Axiftkaran bir û baweriyên xwe yê Konferansê pêşkêş kirin û bersivên pırsan dan. Guhdarvanan ji destûr standin û bir û baweriyên

xwe bî serbesti anin zman.

Roja 16 ê Nisanê di vekirina civinê da berpırsiyarên gruban, bî kurtayı raporên xwe yê roja bori pêşkêş kirin.

Piştî van raporên, Wezirê Cıvaki û Cıwani û serokê Belediye Bremen **H. Scherf** axift. Paşê silavname Wezirê Pırsa Jinan û Malbat yê Eyaleta Schleswig Holstein **Gisela Böhrk** hat xwendin.

Paşê li bernamêyê da li: ser Deklerasyona Bremen a **"Mafên Mirovati li Kurdistanê"** hat axiftin, ku ew deklerasyon bî destê komisyonek ve hatibû amadekirin. Pêşneyara komisyonek hat pêşkêşkirin û ser da danustandin hat kirin. Bî gor pêşniyaran Deklerasyonek hat qebûl kirin.

Dawiya Konferansê, civinek ji bo presse çêbû. Dı vi civinê da Sertaç Bucak bî nave **"İnsiyatifa Mafên Mirovati li Kurdistanê"**; Paul Tifnbach, Parlementerê Bremen; Robert Philipson, Profesore Universita Roskilde/Danimarka; Pelle Voigt, Parlementerê Danimarka; Berit Ericksson, Parlamentera Swêd; Profesora Aubin Heyndrickx, direktore Universita Gent yê qısmata toksikolojiyê ji Belçika; ji Eniya Kurdistanê İraq Hışyar Zıbari beşdar bûn û bersivên pırsan dan.

Konferans, ji destpêkê hetani da-wiyê bî dereceki bilind û bî disiplin

derbaz bû. Ditina pıranîyên beşdarên li ser van nuqtan gihişt hev: **"Ev Konferans, di diroka tekoşina gelê Kurd û pırsa wi ya navnetewî da gawek diroki ye. Aliyê din da ji, qebûlkirina Deklerasyona Bremenê û armancên wi yê pêşdaçûyî, wesi-qeyek diroki ye.**

Konferans biryarek pır pêvist girt: **Gereka rêxistinêk ji bo "mafên mirovati li Kurdistanê"** were sazkirin. Û ev rêxistin, pırsa gelê Kurd yê mafên mirovati li Kurdistan bî cihanê bide agahdar kirin.

Ji her awayî ve ev Konferans, di diroka gelê Kurd da cihek girîng digire. Ji ber ku, ev cara yekemîn e ku mafên gelê Kurd di platformek usa navnetewî da tê axiftin. Ji aliyê din ve ji; bî beşdarbûn û bî imzan ve pır kesên bî nav û deng alikariya xwe bî gelê Kurd ve nişan dan.

Nivisa jorin ji "Dengê KOM-KAR" hatiye wergirtin.

DAXUYANIYA (Deklarasyon) KONFERANSÊ ▀

DAXUYANIYA BREMENÊ LI SER MAFÊN MIROVATI LI KURDISTANÊ

Komcivina navnetewi ya "Mafên Mirovati Li Kurdistanê" di rojên 14-16'ê Nisanê da li bajarê Bremenê di bin baskên Seroka Parlamentoya Eyaleta Bremenê Dr. Dieter Klink da pêk hat. Di Konferansê da ji 16 welatan akademivan, rojnamevan û sineetkar beşdar bûn. Li ser rewşa gelê Kurd û li ser binlingxistina mafên mirovatîyê Konferansê ev tiştan da ber çavan:

Gelê Kurd, ji gelên kevnare ye li Rojhilata Navin da ku nifusa wi 20 milyonê zêdetir e û ew, xwedî çand û tarix e. Ew di welatê xwe yê parçekirî da —li Tirkîyê, Îran, Iraq û li Suriyê— di nav bîndestîyeke giran da ye. Ev dewletana mafên netewî û dêmokratîk ya gelê Kurd nasnakî. Tekoşîna gelê Kurd bona ku ew di welatê xwe da di azadîyê da bibe û weki gelên din xwedîyê şertên wekhevîyê bibe, hetani iro bi hovîti hatin pêlixandin. Konferansê ev rasti bi nîmûneyên Tirkîyê û Iraqê va kir wesiqeyek û da berçavan.

Komara Tirkîyê di Yekîtîya Netewan da û Konseya Ewropî da endam e. Wê, Daxuyaniya Navnetewî ya Mafên Mirovati, Peymana Mafên Mirovati ya Ewropa, Daxuyaniya Paşîn a Ewropayê bo Ewleyî û Tevxebatê (Peymana Helsinki) û di demeki nêzik da Domandîna Civîna Vîyanayê imza kirîye. Tirkîyê di aliyê din da ji sala 1925'an wîrda, diji prensîbên huqûqî ya navnetewî, hebûna gelê Kurd înkâr dike. Hukma Tirk siyasêteke sistematîk dajo, bona ku gelê Kurd bi dara zorê bide helandin, huwîyeta wi ya netewî ji ortê rabîke û bike "Tirk". Ew siyaseta nijadperest iro ji bi hêzîrîn tê domandin. Ew zîlm û kîrînen han dide xuyakîrîn, ku mafên mirovati çawa bêperwa tînen binlingxîstî.

Zarokên Kurdan xwedîyê mafên xwendin û zanyarî bi zmanê dayîkê ni nîn. Bi zmanê Kurdî axiftin, bi qanûnan ve hatiye qedexekîrîn. Bi zmanê Kurdî neşriyet; bi Kurdî mûzîq çêkîrîn, belavkîrîn û guhdarkîrîn, pîrozîkîrîna cejnên neteweyî û kevneşopî wek sûc tê ditîn. Hukma Tirk navên gund û bajarên û navên cihên coğrafîk ên bi Kurdî wergerandiye Tirkî. Kurd, ji bo bir û bawerîyên xwe tînen girtin û ceza digîrîn. Li serdagirtînen leşkerî li gund û bajarên, cezadayîna bi tevayî û girtînen bi kêyfi bûne karên rojane. Belavkîrîn û mefîkirîna gundan bi navê "Parastîna sazûmana gelemperî" û bi navê "parastîna millî" piştra 12'ê îlon 1980'ê zêde bû. Xebatên hukumeta Tirk, ya aborî li mîntiqeya Kurdan bi kêrî piraniya gelê Kurd nayê. Ev siyaseta dibe sedemê bêkariyê, betaliyê û malanbarkîrîne.

Hukumeta Iraqê di van salên dawî da diji gelê Kurd sucê qirkîrîne bi kar tîne. Bi hezaran gundên Kurdan ji aliyê ordiya Iraqê ji ortê hat rakîrîn. Mirovên wan gundan an hatin qirkîrîn, an ji di kampan bin şertên giran da hatin komkîrîn. Hukma Iraqê, bi karîna çekên kimyewî li diji Kurdan hemû prensîbên huqûqê ya navnetewî dide bin lîngan. Piştî vê karîne 16 Adar 1988'an li Halepçê 5000 mêr, jin û zaro hatin kuştin û pirtîrî 10 hezaran kes ji bi girani birindar bûn. Ev qedera çînîqî, li gundên dorberê ji li diji mirovan tê pêkanî. Ev tişt siyaseta qirkîrîne ya hukumeta Iraqê li diji Kurdan dide berçavan. Qedera 8 hezar Kurdên ji mîntîqa Barzan, ku

ji Tirmeha 1983'an wîrda "ji ortê rabûne" û "wînda bûne" hin ji nayê zanîn. Planê Iraqê, ku dixwaze 200 hezaran bêtir mirovan sirgûnê çolên Iraqa Başûr bike, di 25 Nisan 1989'an da wê pêkbê.

Bi bir û bawerîya têhlûke ya ji ortê rakîrîna gelê Kurd "Konferansa Navnetewî ya Mafên Mirovati Li Kurdistanê" dixwaze ku ev daxwazên jêrîn bînen cih:

- Divê Rêxistîna Yekîtîya Netewan di çarçevêya prensîpên wekhevîya mafên gelan da, li gor prensîbên huqûqa navnetewî ji bona bi serbestî tayînkîrîna qedere û zelalkîrîna pîrsan, bila rewşa gelê Kurd bi zûtrîn bike naveroka xwe;

- Konseya Ewropa, ku Tirkîyê ji endama wê ye, dewletên ku Konferansa Tevxebat û Ewletî imzakîrîne û di sa Koma Aborî ya Ewropa ku Tirkîyê ji bona endametiye serî lîxîstîye, bila zorê bidin Tirkîyê ku ew wezîfeyên xwe li gora peymanên navnetewî bine cih û rûmetê bide mafê mirovatîyê;

- Dewletên ku dixwazî pîrs û dubendîyên li Rojhilata Navin bi aşîti halbîkî, divê di konferansekî pêşedemê da, ku li ser Rojhilata Navin dibe ku kombibe, pîrsa Kurdî ji tîxin naverokê û cehd bikin bona ku temsilkarên siyasî ya Kurdan ji bikevî Konferansa Navnetewî ya Aşîtiya Rojhilata Navin;

- Sekreterê Giştî ya Yekîtîya Netewan, hêzên ku di paşê şerê Iraq-Îranê ji bona aşîtiyeke edlayî dixebitî, bila cehd bikin ku temsilkarên gelê Kurd ji di wan civînan da cihê xwe bigîrî;

- Divê ew welatên peşveçûyî, heta ku mafên mirovati li Kurdistanê pêkneyê, bila hemû alîkariyên leşkerî û aborîyê bona Tirkîyê, Iraq û Îranê bidin birin.

- Divê hemû kes û rêxistî, sitemkariya li ser gelê Kurd, êriş û kîrînen bona ji ortê rakîrîna hebûnen wi ya diroki, çandî û ji ortê rakîrîna hûwîyeta wi ya netewî protesto bikin û divê ew cehd bikin ku kesên sirgûnkîrî vegerî cihên xwe; qedera kesên hatîne revandin û windabûyî were eşkerekîrîn; divê hemû rêxistî û kesa giraniya xwe bidin li ser Tirkîyê ku ew wan kesan ra, ku ji Kurdistanê Iraqê derbazî Tirkîyê bûne angorî Konvensiyona Cenevrê statûkoya multeciya bide naskîrîn;

- Divê mafên zman û çandî ya Kurdên ku li dervayî Kurdistanê dijî, bînen naskîrîn; bila hemû hukûmetan bona parastîna zman û çanda Kurdî, bona xebitandîna wi di hinbûnê da, di çapkîrîn û belavkîrîne da û di pêywendîyên resmî da çî lazîme çêbîkî;

- Konferans, avakîrîna rêxistîneki serbixwe ji hukûmet û dewletan (non-governmental) pêwîst dibîne, da ku ew rewşa gelê Kurd sêrbike û di warê binlingxistîna mafên mirovatîyê da gelemperê agahdar bike;

- Konferans biryar dide ku bi destê "Însiyatîfa Mafên Mirovati Li Kurdistanê" vê "Daxuyaniya Li Ser Rewşa Mafên Mirovati Li Kurdistanê" ji Sekreterê Giştî ya Yekîtîya Netewan, Konseya Ewropa, Koma Aborî ya Ewropa, Seroka Parlamentoya Ewropa, serokên dewlet û hukûmetan û rêxistînen navnetewî ra bide şandin.

Bremen, 16ê Nisan 1989

Lı Ser Tırkiyê û Kurdistanê DÎTINÊN HEYETA EYALET SAKSONYA JÊRÎN

Dı navbera 27'ê Çiriya pêşin û 4'ê Çiriya Paşin da ji Eyaleta Saksonya'ya jêrin a Elmanya Federal heyetek (ku ji 6 kesan pêkhatibû û di nava wan da du parlamenter ji hebûn) ji bo lêkolîna rewşa 70 hezar Kurdên penaber, ku xwe li Kurdistana Tırkiyê girtibûn, çûn Kurdistana Tırkiyê û zivîrî. Ev heyet, di 18.11.1988'an da bi beşdariya Rexas-tina Pîştgirtî bi gelê bîndest ra (GFBV), Medico International, SPD, Grûba Parlamento ya Keskan û KOMKARê cûinek çêkirin û di ciwî-nê da dîmên xwe li ser Kurdistan û Tırkiyê pêşkêşî beşdaran kirin, bersiva pîrsa dan.

Reinhard Seyler

(Mamostayê ku Kurdistanê baş nas dike)

"Em, di 27'ê Çiriya Pêşin da bi balafirê çûn Enqerê û ji wê derê ji derbasi Wanê bûn. Balafirgeha Wanê ji ali eskeran va hatibû hêsarkirin. Çar wezîfedarên MÎT'ê hatin pêşiya me. Ji wê gavê pêda yek deqeki ji me tenê nehiştin. Her hereketê me di bin kontrolê da bû û em tim di bin çav da bûn. Em, ew şev li Wanê man, dotira rojê me berê xwe da Çolemêrgê (Hekkari). Dî rê da em, li her qunci hatin kontrolkirin. Li Çolemêrgê, ji sivilan bêtir esker hebûn. Tiştê balkêş ew bû ku, ji polêsên heri biçûk bigre heta cendîrman, hemû ji hatina me agahdar bûn. Dema ku me diditin, pîrsa "hûn parlamentêrên Elmanyayê ne?" dikirin."

"Berya çûyina me, me, bi riya Wezaretê Xaricî ya Elmanya daxwaziya çûyina xwe kiribû û ji bo vê yekê musade standibû. Hukumeta Tirk, derheqa gera me da hemû mewziyên xwe yê Kurdistanê agahdar kiribû. Ji bo ziyaretkirin û lêkolînê em çûn

kampa Geverê (Yuksekoval). Lê ji ber ku cihê razanê tunebû, em, li Çolemêrgê di oteleki da bi cih bûn. Dî navbera Geverê û Çolemêrgê da 70 km hebû. Divê em bi taksiyan biçûna û bihatana, lê şoforê taksiyan ditirsîyan. Polês tenê rêça me ne di ajot, serê saetê dihatin û pîrs dikirin ka emê çî bikin û bi kuda herin."

(Reinhard Seyler, dia-filmên ku li kampê kışandibû nişan dîda û pêra ji xeberdana xwe didomand. Dî filmên dia da, balafirên ku bi ser gündên Kurdistanê da bombe dibarandin, tanq, eskerên bi çek, xelkê ku tîrs û xof direviyan û insanên ku bi tesira gazên jehrê sîkratê dikşandî, diwerimîn, nikaribûn nefes bistînin û çavê wan ji hêlinên xwe bazdabûn, hebû. Van wêneyan bi destê zarokan hatibûn çêkirin.)

"Rojnamevanên Îngiliz ên BBC, çêkirina van wêneyên han ji zarokan xwestine. Ji ber ku lêkolîna bikaranîna çekên kimyayî qedexê bû, vê rêyê ceribandine. Kampê penaberan, ji bo doktoran hatibûn qedexekirin. Ji ber vê yekê rojnamevanên Îngiliz, ji zarokan xwestine ku ew serpêhatiyên xwe û tiştên ku ditine bi wêne bidin xuyan. Ji bo îspatkirina bûyeran, vê rêyê fikirine û ceribandine.

"Dotira rojê, gava ku em çûn kampê me bernedan hundir. Diviya em, li benda qeymeqam bisekîniyana. Em sekînin heta ku qeymeqam hat. Piştî ku em ji ali qeymeqam va hatin kontrolkirin, me berdane hundir. Ez bi qasî 50 metre ketim kampê û hêj min li du konan mêze nekiribû, hanhanka derketina me xwestin. Wana wisa dizanibûn ku ez doktor im, ji ber vê yekê ji gera

kampê jî bo mînan qedexeyê kirin. Mînan kir û nekîr qeymeqam jî mînan bawer nekîr, ku ez mamosta me ne doktor im.

(Reinhard Seyler, wêneya plana kampê ya fermî kışandîye. Wê nişan dide û dide xuyan ku, rastiya halê vê kampê jî vê plana han gelek dûr e û hemû kesên heyetê vê bir û baweriyê diparêzin.)

Sabine Baun

"Dora kampê bî dirîtêlan hatiye girtin û lî alî hundîr rêz bî rêz cendirme hatine bicihkirin. Ketina kampê û jê derketin qedexeyê ye, mirov dikare wek kampa girtiyan bî nav bike. Dema ku em çûn wê derê, di kampê da 12 hezar kes hebûn. Yê din biribûn Mûşê yan jî cihên din. Dema ku em lî wê derê bûn, 1037 kes şandin ciheki din. Rewşa wan gelek xirab, şert û zurûfên kampê di haleki ne hal da bû, mirov jî vê rewşê şerm dikir. Di holikên (klûbe) biçûk da -ku dora wan bî potan hatibûn girtin- xwe dîşon, ew jî ku bikaribûna av raykin. Kon, heta tu bêjî tenik in û jî serma û baranê xweparastin ne mumkun e. Di konan da, bîli du-sê betani û kûpeke sêkilo (kûpa gazê) pêştîr, tiştêk tune. Wek alikariya xwarinê, tenê nan û çay tê dayin. Zarok gelek jar bûne û eger rewş neyê başkirin, pîraniya wan nikarin bijin. Qeymeqam digot ku, "30 doktor tim lî vir in û dixebitin." Me pê bawer nekîr. Lewra "konê tendurustî" pis û qirêj bû, tenê texteke gemari û hînek derman hebû, lî meydanê doktor tunebû. Jî bo jinên nexweş, makîneyek sergirti hebû. Ez bî xwe ditirsim ku lî ser wan kursiyên muayenê rûnêm. Lewra di şûna ku mirov bête muayenekirin, mikrobê kursiyên mirovan zêdetir nexweş dikir. Dotira rojê em, lî Çolemêrgê rasti doktoreki Kurd hatin û wi jî me ra got ku, "lî kampê tenê du doktor hene û ew jî carna dixebitin". Ev jî nişan dide ku, qey-

meqam jî me ra derewan kir."

Heidi Alm-Merk

(Parlamentêrê Saksonyaya Jêrin a SPD û endamê heyetê)

"Em, di kampê da zêde rasti zarokan nehatin. Me dit ku, pîranîyên wan nexweş bûn û di konan da radizan. (Dema ku vana digot, wêneyê zarokeki -ku çermê wi bî gîştî çelîzi bû, soregoştê wi derketibû rû û nikaribû xwe lî piya ragire, jî ber vê yekê jî lî ser milê diya xwe radîza- nişan da.)

"Ev zarokê han ku, heta tu bêjî jar, zerbûyî û lî rûyê wi şanên şewatê hebûn, nikaribû xwe lî piya ragire. Lî gor ku diya wi dibêje, hertim emel bûye û piştî çekên kimyayî ketiyê vî halê. Di vê navberê da televizyona BBC xwestiya ku filmê zarok bikşîne, lê serbazên wezîfedar ên wê derê nehiştine. Wênekîşandin lî me jî qedexeyê kirin. Kîşandina film û wê-ne, eger doktor jî lî wir bûya mumkun bû! Bî vî awayî doktor, wê teş-hîsa xwe wek nexweşîneki çerm (cild) a normal nişan bîda û goya wê îspat bikira ku çekên kimyayî nehatine bikaranin!..

"Însanên kampan, jî bo xweşûştinê avê nabin. Ew giha berev dikin, bî agirê wê xwe germ dikin, yan jî dikarin pê germiyekî bixun. Bî perên xwe kûpên gazê dîstin. Lê perê wan jî tune. Dema ku jî mîrinê reviyane, hemû emaretên (ziv, zêr û wd.) xwe yê gîranbuha bî xwe ra anîne, niha bî wan emaretan lazmatiyên xwe yê jîyanê bî dest dîxin.

"Ez dixwazim cardin bala we bikşînim ser babeta tendurustî. Doktorên wê derê, tu tiştêkî jî meslegê xwe fam nakin. Tenê doktorek heye, lê ew jî stajiyer e yanî hêj xwendevan e. Mînan di derheqê welidandinê da pîrsekî jê kir, nikaribû bersiva mînan bîde. Lî kampê, kanalizasyon tune. Di nîveka kampê da çalek hatiye vedan, hemû avên pis diherike wê derê. Wek ku hûn dibî-

nın, Kurd, lı kampê dı nav şertên wisa da dijîn ku, jı bo mirovati rûreşi ye."

Reinhard Seyler

" Dema ku kamp (jı bo penaberan) tên danin, bankayek hanhanka şuhbeyek vedike û perên İraqi bı perên Tırkiyê dıgugurinin. Pışti ku perê penaberên Kurd dıqedê, banka jı wê derê tê hılanin. Niha jı, dor hatiye ser bazırganan. Ew jı, eşyayê penaberan ên xemilandinê, zêr û emaret û eşyayên gıranbuha bı fiyetek erzan distinin. Xaça Sor lı kampê tışteki nake, musade nayê kırın. Tenê konek hatiye vegirtin. Jı Xaça Sor wezifedar jı nıkarın bıkevin kampan. Jı bo muayena doktor xelk, bı saetan hetta bı rojan dıkevın dorê, lewra doktor tune û kes nı zane wê çı wext were."

Beate Tenk

(Lı Saksonyaya Jêrin, dı parlamentoya eyaletê ya Keskan da wezifedar e)

" Lı kampê jı bo zarokan kincê lıxwekirinê tunebû. Pıraniya wan, cakêten ku jı betaniyan hatıbûn çekırın lı xwe dıkırın. İhtiyaciya avê, heta hûn bêjın heye. Jı ber ku bı şev gelek sar e, boriyê avê yên ku hebûn qeşa dıgrın. Jı ber ku kon gelek tenik bûn, baran jı konan dıheriki hundır."

PIRS: *Wek ku jı wênayan jı tê xuyan, kamp tji toz gemar e. Ev toz û gemara han nayê paqjkırın?*

Hannes Kempmann

" Toz nayê paqjkırın. Toz û qırêja 12 hezar insan, dı nav vê kampê da dımine. Ev jı dıbe sedemê gelek nexweşinan. Tıştê ku zêdetırin bala mın kışand, pırbûna eskeran bû lı wê derê. Jı mın ra aşkera bû ku, te dıgo qey hemû Kurdistan jı eskeran pêk

hatiye. Bı rasti jı, dirûvê qışle-yeke eskeri bı Kurdistanê dıkeve. Serê her gavi, em jı kontrolê hatın derbaskırın. Dora kampê bı temami hatıbû girtin. Hım dı kampê da, hım jı lı dervayi kampê qereqol hatine sazırın. Tewrê wan ê lı hember insanan, tewreki rûreşi bû. Bı taybeti lı hember pêşmerge û malbatên wan, bê berpırsiyari hereket dıkırın."

PIRS: *Me lı vê derê bıhist ku xelk, xwerêzkırine û komitên kampê çekırine. Dı derheqa vê babetê da dıtina te çı ye?*

Hannes Kempmann

" Em lı kampan bı tu komiteyek pêşmergeyan ra neketın tşkiliyê."

Heidi Alm-Merk

" Mumkun e ku lı Mûşê û Diyarbekır komitên weha hebın, lê ez bawerım ku lı Geverê tunebû. Me û du jınên Kurd, ku mêrên xwe dı bombeb-arandına çekên kimyayi da wında kırıbûn, hev dit. Wana dıgot ku, zarokên wan nıkarıbûne çend heftenan bıxun."

Dıtınên Lı Ser Kampa Mûşê

Michael - Fender - Dickmann

(Rojnamevan, lı ser navê Der Spiegel û NDR beşdari heyetê bûye)

" Pışti gelek kontrolan em ketın Mûşê. Nehıştın ku em bıkevin kampê. Polês, tım şopa me dıajot; hetta bêyi ku jı me pırs bıkın dıhatın lı masa me rûdınıştın, axaftınên me guhdari dıkırın. Me bı wali ra xeberda, lê wali musade neda ku em bıkevın kampê. Wênekışandın lı me qedexê kırın. Dora 8700 kes lı kampa Mûşê hatine bı cih kırın."

Heidi Alm-Merk

" Kampa Mûşê, 14 sal berê jı bo ke-

sên ku ji erdhejinê xîsar dine hatiye çêkirin. Ji ber ku xaniyên kampê gelek xirab hatibûn lêkirin, xelkê bineci neketine wan xaniyan û teslim negirtine. Niha penaberên Kurd di wan xaniyan da hatine bi cih kirin. Dora kampê bi dirîtêlan hatiye asêkirin. Dirûvê girtigeheke tipik pê dikeve. Di xaniyên du-ode da 25-30 kes hatine bi cih kirin.

Ziyareta Kampa Diyarbekir

Hannes Kempmann

" Piştî ewiqandina roje em ketin Diyarbekir. Em gihiştin otêlê, 5 deqe şunda polês ketin hundir; em ê çî bîkin, bi kuda herin, bi ki ra têkili deynin û wd. gelek pîrs ji me kirin. Me ji wan ra got ku, "ewya em dîzayîna û ne karê we ye", û me ji wan ra got, "me acîz nekî." Lê yek deqeki ji, me tenê nehiştin. Ez dîkarim bêjim ku, hemû polês û eskerên Diyarbekirê ji hatina me agahdar bûn. Dotira rojê em çûn kampê. Dema ku Heidi li devê derê kampê xwest fotograf bîkîşîne, polêsek bi awakî çors li milê Heidi xîst û xwest ku pêşî li wê nekîşandinê bigre. Li ser vê yekê Heidi, du sîle avêt polês. Pêşmergeyên ku ev bûyerê ditin, piştgiriyeke (tezahurat) mezînişan dan."

Sabine Baun

" Kampa Diyarbekir sererasttir bû, di konên biçûk da 20-25 kes hatine bi cih kirin. Konên vê derê ji wek yên Geverê tenik, li hember baran û sermayê bêkêr bûn. Li vê derê imkanê çûndina ba doktor û derva hebû. Bi vê rêyê ji, dîkaribûn hînihtiyayîyên xwe bi dest xîni. Dora kampê bi têtêlan hatibû girtin. Însanên wê derê, ji bo avê 7-8 saet dîketin dorê."

Heidi Alm-Merk

" Disiplin, bi hêziya pêşmerge û malbatên ku li kampa Diyarbekir

hatibûn bi cih kirin, bala min kîşand. Kesên ku me bi wan ra têtêkîlî dani, pîraniya xwe insanên ronakbir bûn. Ji min ra wîsa hat xuyan ku, pêşmergeyên ronakbir li Diyarbekirê hatibûn bi cih kirin."

Sabine Baun

" Berya hatina me li kampê protestoyek hatiye kirin. Pêşmergeyên ku ji bo protestoyê civiyane, ji alî eskeran hatine gullebarankirin. Dema ku em çûn, hêj li erdê kovanên vala hebûn. Ji ber vê bûyerê û her wîsa bûyereke Geverê, penaberên Kurd hatibûn girtin."

Heidi Alm-Merk

" Polês, li hember penaberan gelek zalim û bêberpîrsiyar in: Tu dibê qey kesên hember wan mêtî in, ne insan in. Em hêj li wê derê bûn, pêşmergeyek tevi jîna xwe, ji bo zarokê xwe daxwaziya çûndina doktor kirin. Rewşa zarok ne baş bû. Tevi vê rewşê ji, musade nedan wan. Lê piştî ku min û Hannes bi wan ra xeber da, musade hat dayin. Pîrsa tendurustî, heta tu bêji rewşeke xeter tîne pêş çavan. Jixwe ev pîrsgirêka han, li her derê Kurdistanê heye û pîr paşda ye."

Hannes Kempmann

" Li ser kampê, tîm helikopter digerin. Hukumetê, guh nedîda rewşa wan insanan, bi taybetî ji rewşa zarokên ku bi çekên kimyayî hatibûn şewitandin û birindarkirin. Ez bawer im ku, nîzîm-fîrina helikopteran wek psikolojîk li ser wan insanan bandoreke xirab peyda dike."

Michael-Fender-Dickmann

" Gelek kesên ku min li kampê bi wan ra xeber da, di gotin ku hêj li Iraqê, li Erbilê 70-80 hezar girtiyên Kurd hene. 30 hezar kesên ku ji ber

rênedana Tirkîyê nîkarîbûne jî sinor derbas bîbîn û mecbûrî şer dîbîn jî hebûne. Qet jêra şîk tune ku, wê pîraniya wan dî demek nêz da bên kuştin. Pêşmergeyekî (sûretê wî lî cem heye), jî bo îspatkîrîna bombebarana çekên kimyayî û xîsara wan du fotograf nişani me da. Yek jî wan fotografan, bombeyeke napalmê -ku du metre bilind bû- û pêşmergeyekî lî rexê wê nişan dîda, yê dîn jî termekê tazî, şewîrandî û bî kul û bîrîn nişan dîda. Lî gor agahdariyên dawî, ku me jî Wezaretê Xaricî girtîye, 3200 penaber teslimê Iraqê bûne. Hukumeta Tirk, Kurdên Iraqê wek penaberên siyasî qebûl nake. Jî ber wê yekê jî, berpîrsiyarê penaberan ê Yekîtîya Miletan nîkarîna tîkîlî vê rewşê bîbîn. Xebata Xaçê Sor (Kızılay) lî kampan, jî alî hukumetê va hatiye qedexekîrîn. Ev rewşa han, jî hatîna penaberan vîrda dom dîke. Alikarî, tenê bî dayîna konan e, wekî dîn tu alikarî nayê kîrîn. Ango jî bo xapandîna sazîyên navnetewî, tenê konên xîr û xalî hatîna dayîn. Lê lî gor xebereke ku niha gîhayê me, Xaçê Sor vê heftê musada vekîrîna numra hesabekî alikariyê stendiye. Ez bawer im, eger jî bo xebata Xaçê Sor rê bê vekîrîn, wê rewş hînek baş bibe."

PIRS: *Pîştî gera we ya Kurdîstana Tirkîyê û Tirkîyê, bîr û bawerîya ku jî we ra çêbûye, rewşa kampên Kurdîstanê û penaberan û lî ser demokrasîya Tirkîyê ditînên we çî ne? Dîvê çî bête kîrîn?*

Hannes Kempmann

" Dî destê yekem da me kar û xebatên xwe jî bo berdana 4 girtîyên Yewnani bî hêz kîr. Jî bîlî vîya me rewşa Tirkîyê bî awakî fireh bî rîya rojname û televîzyonê aşkera kîr. Pîştî bûyerên ku me bî çavê xwe dît û jîyan, me dît ku lî Tirkîyê bî navê demokrasîyê tu tîştêk tune. Jî vîya çêtir îspat tune. Eger vana lî hember

parlamentêrên bîyani jî bî vî awayî hereket bîkîn, sed qatê vîya tînn serê demokratên Tirk û Kurd.

" Em jî hukumeta Federal dîxwazîna ku, jî bo mafên mirovati zor bîde Tirkîyê, dî vî wari da tîştên pêwîst bî cîh bîne û penaberên ku jî Tirkîyê tîn vîr, bî tu awayî paşda neşîne. Eger em vegerîna ser rewşa penaberên Kurd: Rewşa wan gelek xîrab e. Me bang lî hukumeta Saksonyaya Jêrîn kîr ku, alikariya insanî lî penaberan bête kîrîn. Dî vî wari da hukumetê, dî bîna navê "Fona alikariya Kurdîstan" foneke saz kîr. Niha dî butça vê fonê da pere tune. Lê lî gor lîkolîn û encamên ku ez tîdîgîhîjim, em dîkarîna bî rîya Xaçê Sor ya Elmanya alikarî bîşînin. Bêguman ev alikarî jî, ançax bî rîya Xaçê Sor a Tirkîyê mumkun e. Lê wek ku mîna got, jî bo alikariya insanên van kampan hêj Xaçê Sor (Kızılay) ne xwedî bîrêvêbîrîyê ye. Me dîxwest ku ev pere bî rîya Medico International yan jî GfbV bîgîhîje wê derê. Lê hukumeta eyaletê, vîya qebûl nekîr."

Heidi Alm-Merk

" Pîştî hevdiînên me bî Wezaretê Sosyal a Eyaletê ra, soz dan me ku 800 DM. pere bîdîn. Me dî vî wari da lî gor tîştên ku me dît, cîhên ku wê alikarî bête kîrîn aşkera û tesbîtkîr. Me got ku, gerek alikarî bî taybetî dî derbarî stari, çek û libas, xwarîna û tendurustî da bête bîkarînanî."

Reinhard Seyler

" Jî bîlî vana em hewl dîdîn ku lî mîntîqên cîhê, lî Elmanya Federal, civînan çekîna, bala xelkê bîkîşîna ser wê derê û bî vî awayî zor bîdîn hukumeta Tirkîyê."

Temamiya vê nîvîsê dî Dengê KOMKAR, hejmar 112'an da, bî Tirkî hatiye weşandîna. Me, lî vî tenê beşa ser Kurdîstanê wergerand.

DİSİPLİN

ANTON MAKARENKO

Werger: DILSOZ

Gelek maneyên peyva "disiplin" hene. Hinek jî vê peyvê, mana hemû qaideyên ku tîn bikaranîn derdixin. Hinekê dîn, piştî perwerdegariyê exlaqên ku di meriv da peyda dibe wek disiplin bî nav dikin. Grûba sîsiyan jî, tarîfa bî cihanina hemû tîştên ku tîn gotin dikin. Ev fikrên cûda, kêr zêde rastiyê nişan didin. Lê jî bo bî cihanina perwerdegariyekî baş divê meriv di derheqê peyva disiplinê da jî zana be.

Carna jî kesên sernerm, ku jê ra çî bê gotin ew dê bike, wek merivê bî disiplin tê naskirin. Tabî ye ku di gelek rewşan da jî kesên weha tê xwestin ku, daxwaziyên amir û organên bilind yê ser wi bêyî ku wext derbaske û wek ku tê xwestin bî cih bin. Lê di civata Sovyet da, yê ku her daxwazî bî cih bine wek kesên bî disiplin nayên hesabandin. Tena serê xwe disiplin, têr nake. Bî koritî bî cihanina daxwaziyên, di perwerdegariya berya şoreşê (şoreşa Oktoberê) hebû.

Em jî hemwelatiyên Sovyet disiplinêk girantir dixwazin. Em, naxwazî tenê têbîgihîjî ka ferman bî çî armancî, jî bo çî wê bête bî cih anin. Divê şexîs bî xwe jî, bî çalaki lîkolîne bike, jî ber xwe va wezîfên xwe baştirin bî cih bine. Jî bîlî viya, divê hemwelatiyên me di hemû demên jîyanê da xwe hazîrî bî cihanina wezîfên xwe bike. Gerek jî bo vi tîştî lî benda ferman yan jî rêvebirîyek nemînin. Divê berbî pêş gav bavêje û bî daxwazîya xebatê dagirtî be. Bî vi awayî em hêvidar in ku, wê insanên me di vê babetê da tu astengî û dijwari nasnekî. Berevajî, jî insanên Sovyet tê xwestin ku tenê tîştên jî bo wan bikêr e û lî xweşa wan diçe nekî. Lewra evana dikarin zirarê bî-

dîn hinekên dîn û hemû civatê. Jî xeynî viya, daxwazîya me ew e ku hemwelatiyên me tenê di kar, karxanên xwe û dorhêla ten a malbata xwe da nemînin; hay jî jîyan, kar û tewr -herketên insanên dîn jî hebî; alîkarî di gotinê da nemîne û bikeve herketê, di vê babetê da jî jîyana xwe ya rehet piçek fedakari bikin. Lî hember dijminên me hemûyan, divê her kes tepkiyek bî biryar nişan bide, hemû xeteran û rewşên ne xweş bide pêş çav û tim çavneriyê bike.

Bî yek gotinekî, di civata Sovyet da kesê ku di hemû cûre şertan da tewrê herî bikêr qebûl dike, em, wi wek mirovê bî disiplin nas dikin. Bî vi awayî eger rasti rewşeke ne kêrhatî bê jî, wê bî biryariya xwe nişan bide. Tenê bî disiplinê ango bî rênişandani û bî cihanina her tîştê ku tîn gotin, peyda kirina kesekî bî disiplin ne mumkun e. Hemwelatiyên Sovyetî yê bî disiplin, bî bandora çalakiyên bikêr, ku di serî da tîn çêdîbin. Em dikarin van çalakiyên bikêr weha rêz bikin: Perwerdegariyê siyasî ya baş, kultura gîştî, pirtûk, rojname, di berkêşaniyê da xebat, çalakiyên sosyal, listîk, xebatên dîn û bihndayî ku di dereca duwemîn da tîn xuyan. Tenê bî bandora pevgîrêdana van çalakiyan, mirov dikare perwerdegariyek baş bî cih bine. Bî vi awayî jî mirov dikare di civata Sovyet da hemwelatiyên bî disiplin bigihîne.

Şîreta me lî dê û bavên ew e ku, vê seretaya (prensîb) sereke tim bî birbin: Disiplin, bandora hîm tedbirên "bî disiplin"î nîne. Lê hemû sistema perwerdegariyê, hemû derdorên jîyanê, hemû çalakiyên ku zarok di bin bandora wan da dimîne tê

pêşberî mirov. Dî vê manê da disiplin, sedemê perwerdegariyeke baş, metoda wê, navgîna wê nîne. Lê encama wê ye. Disiplineke dî cih da, bî vê perwerdegariya rast pêk tê. Dî vê perwerdekar, dî vi wari da hemû imkanên destê xwe û enerjiya xwe bî kar bine. Jî ber vê yekê ye ku gava dê û bav pirtûki didin law yan jî keçên xwe, hevaleki nû didin nasin, rewşa navnetewî, xebatên cihê kar û derheqê serfiraziyên da xwe dixafin, dîcehdin ku perwerdegariyek bîlindtir bîdî wan. Her weha em, jî disiplinê encama gîştî ya xebata perwerdegariyê derdixin.

Ev xebata han, bî pêkanîna disiplinê ra pevgirêdana xwe yê nêz heye û pîr caran bî bîngeha xwe yê teng cihê wan têkelkîrîn (tevlîhevîkîrîn). Ev jî rejim e. Çawa disiplin encama xebata perwerdegariyê be rejim jî navgînek an jî metoda perwerdegariyê ye. Dî navbera rejim û disiplinê da ferqiyên pîr gîring hene û divê dê û bav pê zanibin. Mesela, disiplin bî beşekî va girêdayî ye, ku em dixwazî bî qîsûr be. Em dî jiyana karê xwe û malbata xwe da jî bo çêbûna disiplinê herî baş û hîşk dîcehdînin. Dî vê xebatê da mirov nîkare bî awakî dî bîfîkîre. Disiplin encamê e. Berya her tîştî tîkoşîna me, jî bo stendîna encama herî baş e. Em ne bawer in ku, em rastî mirovekî bîn ku bîbêje: " Ne hewce ye ku em behsa disiplinê xwe bîkî. Ancax idara me pê dibe..."

Mirovekî weha ya kêmaqîl e yan jî dijmin e. Divê insanekî normal, dî sewiyekî herî bîlînd da disiplinê çê bike û jî bo stendîna encama herî baş bîxebite.

Îca babeta rejimê, babetek tam cihê ye. Wek ku me berê jî got, rejim tenê navgînek e. Pîrî caran, her navgîna ku me digîhîne armancê û bîkêr tê, em tîdigîhîjin ku wê jê bête îstîfade kîrîn. Jî ber vê yekê ye ku, her dem îmkana peydakîrîna disiplinê herî baş -ku daxwazîya me ye- heye. Lê îmkana temsîlkîrîna rejimê herî

îdeal tune ye. Dî vê rewşê da, dî şûna rejimê herî kêrhatî da rejimêkî dî dîkare bîbe yê herî kêrhatî dî hîn rewşan da.

Dî şertên cihê da, rejimê malbateke yek-tîp nayê qebûlkîrîn û divê neyê qebûlkîrîn. Emrê zarokan, rehetîya wan, rîya dîbîstanê, şênahîya kuçeyan, şertên dî avahîya rejimê dîde xuyan û dîde guhartin. Gerek rejimê weha dî malbateke pîr-zarok da bête sazîkîrîn. Dî malbateke yek-zarok da jî, mirov dîkare rejimê pîr cihê saz bike. Eger rejimê -ku jî bo zarokên bîçûk encamên gelek bîkêr peyda dîke- lî ser zarokên mezintir bête bîkaranîn, dîkare zîrarê bîde. Disa xusûsiyetên rejimêkî ku lî ser zarokên qîzîn tê bîkaranîn jî heye. Evya, bî taybate gava ku mezin dîbî dertê holê.

Wek ku wê jî viya jî bête famkîrîn, tîşteki neguhêrbarî tune. Hîn malbat, pîr caran dîkevîn şaşîyeke weha. Tîm bawerî bî başîya rejimê bîkêr -ya ku dî her rewşî da tê çespanîndî- heye. Tevî ku bî kêrî zarokan, dê û bavî jî tê, heta dawîyê tê parastî. Rejimêkî weha; bî zerar e, metodekî wîsa ye ku, tu alîyekî wî yê bîkêr tune.

Me got ku, dî rejimê da wek avahî tîşteki neguhêrbarî tune. Tenê navgîneke perwerdegariyê ye. Her perwerdegariyek armancên xwe yê taybetî hene. Ev armancên han jî, her dem guhêrbarî û tevlîhevi nîşan dîdî. Mesela, dema ku zarok hêj gelek bîçûk in wezîfeyek gîring dîkeve ser milên dê û bavî, ku zarokan hîni paqîjîyê bîkî. Jî bo ku dê û bav bîgîhîn armancê xwe, hînek rejim lî ser zarokan tî çespanîndî. Wê çawa xwe bîşon, wê jî cihê avlîxwekîrînê û serşokê çawa îstîfade bîkî, çawa ders bîxebîtin, jî cihê razanê heta masê wê odê çawa paqîj bîgîrîn, wê çawa jî heqê karên malê derên, fêr dîkî. Bî awakî sistematîk çespanîndîna vî rejimê, gerek tucar jî alî dê û bavî neyê kîrîn. Divê çespanîndîna jî nêz va taqîp bîkî, gava za-

rok nıkarıbın jı ber xwe va jı heq derên wê gavê dê û bav dıkarın alı-kari bıkın, û divê jı zarokan xeba-tek çare çar nexwazın. Eger ev siste-ma han bı awaki baş bête sazırın, wê encamên baş bıde. Wê demeki wi-sa bê ku, zarokên ku paqıjıyê jı xwe ra kırına exlaq wê bı destên qırêj lı ser sıfrê rûnenên. Dı rewşek weha da, tê wê manê ku armanc gıhaye hedefa xwe. Jı bo ku mırov bıgıhıje vê armancê, rejıma ku tê çespanđın êdı hukmê xwe wında dıke. Bêgu-man evya dı rojeki da nayê guhar-tın. Divê gav bı gav rejimeki dın bı-keve şuna wı. Divê armanca vê yekê, qewırına exlaqên paqıjıyê yên he-yi be. Pışti ku ev jı bête bı cih kırın, armancên tevlihevtır û gıringtır lı benda dê û bavan ın. Pışti viya, pê-wıst nine ku dê û bav jı paqıjıyê ra eleqe nişan bıdın, dı eyni wextê da evya wındakırına enerjıyeke bı ze-rar e jı. Eger ev tewrê han bête me-şandın, dı dereca nexweşê paqıjıyê da exlaqê paqıjıyê dı wan da (zaro-kan) bı cih dıbe. Kesên weha, jı bıli paqıjıyê xwedi tu armanceki nının. Carna jı, sırf jı bo ku destê xwe qırêj nekın, jı mıjûliyeki bıker dırevın.

Eger em vê minakê jı bıdın ber çav, em dıkarın bêjın ku feyda rejimeki tışteki alosbar e (muwaqet e). Bıker-hatın, navgıneke pır cûda ye. Lê re-jım, tenê navgınek e.

Dı dawıyê da, jı bo dê û bav imkana sazırına yek rejimeki tune ye. Ge-lek rejım dı rojevê da hene. Pêwıst e ku, yê heri bıker bête hılbıjartın. Jı ber ku rejımên bıkarınê guhêrba-ri nişan dıdın, divê her gav dı mal-batên Sovyeti û hemû derdoran da hın xusûsiyetên taybeti jı hev bân veqetandın.

Em dıxwazın, bala dê û bav bıkış-ın ser vê nuqtê. Dema ku hın jı bo malbata xwe rejimeki hılbıjêrın, ge-rek hılbıjartınek baş bıkın. Gere-k hemû qaıdeyên jıyanê jı alı malbatê va bête pejırandın. Sedemê viya, çespanđına qaıdeyên bınavkırı yên ku mıroveki dı malbata xwe da dı-

çespine , jıyanê balkêştir dıke nine. Lewra, jı bo ku hın bıgıhıjın wê ar-manca ku behsa wê dıbe, ev tıştên han pêwıst ın. Gere-k hın jı, bı her awayı dı derheqa vê armancê da a-gahdar bıın, hay jê hebın. Rewş çı dıbe bıla bıbe, divê hım lı ba zaro-kên we hım jı lı ba we, rejım xwedi xusûsiyetek aqılmendi be. Eger hın dıxwazın zarokên we bı wext bân malê û bı hın kesên dın ra lı ser sıfrê rûnenên, divê zarok têbıgıhıjın ku evya jı bo hêsankırına karê dê yan jı jınıka karker (xızmetkar) e. Bı vi şıkli, mırovên malbatê rojê çend ca-ran lı hev dıcıvın. Dıtın û hisên xwe jı hev ra dıbêjın. Eger hın dıxwazın zarokên we dı fıraqên xwe da ber-mayı nehêlın, aboriya malbatê bı-dın ber çavan, hurmetê jı xebata dê û bav, bı pırani jı kesên xwarınpêj ra nişan bıdın, gerek pêwıstiya vana têbıgıhıjın. Hın malbat dıxwazın ku, zarokên wan lı ser xwarınê bê-deng bıın. Zarok jı, vê daxwazıyê bı cih tının. Lê ne zarok ne jı dê û bav, hay jı vê qaıde tunın. Eger jı dê û bav bête pırskırın, sedemê vê yekê weha nişan dıdın: "Eger lı ser xwarınê , bête axaftın, xwarın dıfre boriya ne-fesê." Ev qaıde bı temami bê mane-ye. Tevı ku pırı caran lı ser sıfrê tê xeberdan jı, mırov rastı rewşeke bıhtengıyê nabe.

Bı vê armancê, tevı ku mırov xusû-sıyetek aqılmendi dıde rejıma mal-batê, divê em bıının bıra xwe ku , bı qası ku mırov acız dıbe, şırove-kırına gıringıya hın qaıdeyan (kı-ıan dıbe bıla bıbe) tu feyde nade. Dı-vê mırov, zarokan bı izah û şıro-vekırınên weha nede acızkırın. Ge-rek zarok jı ber xwe va pêwıstiya wı têbıgıhıjın. Dı hın rewşên mecbûrı da, rênişandan pêwıst e. Bı tevayı divê em bıcehdının ku zarok exla-qên bı kok û baş bıstının. Jı ber vê yekê jı tıştê heri gıring, divê mırov gırani bıde ser minakên baş û bı-ker. Tekrarên derheqa tewrên kêr hati û şıretên aqıl, dıbe ku pêşi lı tewreki rast bıgre. **(dumahik heye**

JI NAV WEŞANAN



Malmisanij

Mehmûd Lewendi

Lı Kurdîstana Bakur û lı Tırkiyê

ROJNAMEGERIYA

KURDÎ

(1908-1981)

Pirtûk, bibliyografya ye lı ser rojname û kovarên Kurdî yên ku dı navbera salên 1908 û 1981' an da lı Kurdîstana Bakur (Kurdîstana Tırkiyê) derketine.

Niviskarên pirtûkê, Malmisanij û Mehmûd Lewendi, dı warê lêkolina diroka nêzik ya gelê Kurd da xızmeteke baş kırine bı vê xebata xwe. Hêvi ew e ku, gelek lêkolinên weha çêbin, da ku diroka gelê me bı her awayi derkeve ronahiyê..

Mela Mehmûd Derşewi

MIŞTAXA ÇIYA

JI GOTINÊN PÊŞIYA

Çawa ji sernavê pirtûkê ji diyar dibe, ew berevoka gotinên pêşyan e. Lê ev yekemin pirtûk e, ku têda gotinên pêşyan bı şirovekırin tên nivisandin. Gelek ji wan gotinên pêşyan bı çiroka efrandına xwe va tevayî cih girtine.

"Mıştaxa Çiya Ji Gotinên Pêşiya" cara pêşin dı sala 1979'an da bı tipên Erebi hatiye çapkırin. Ev çapa nû bı tipên latini ye, û bı destê Serbest Zaxoyi hatiye amadekırin û lı Stockholmê ji nû va hatiye çapkırin. Zaxoyi, lı dawiya pirtûkê ferhengogek ji daniye ku xwendevan hın peyvên herêmi bınasın û bı hêsani jê fam bıkin.

Pirtûk 275 rûpel e, bıhayê wê 60 kronê Swêdi ye. Ji navnişana jêrin tê peydakırin.

Rasheed M. Ab
Bergensgatan 12. 2 tr.
164 35 Kista/ Sweden
Tel: 08/ 750 49 55

Mahmut Baksi

GUNDIKÊ DONO

(roman)

Romana "Gundikê Dono" ya Mahmut Baksi, lı Stockholmê dı nav weşanên "Orfeus" da ronahi ditiye. Çawa tê zanin kevneşopiya (tradisyon) romana Kurdi ne ewqas kevn e. Dı warê romanê da, taybeti bı Kurdiya jorê (Kurmanci) efrandın kêm in. "Gundikê Dono" ji bo bı cihkırina kevneşopiyeke nû, efrandineke baş e ku tevi edebiyate me ya nû bûye.

Anton Pavloviç Çêxov

MIRINA KARMEND

Ev çirokên Çêxov, lı ber wergerên Swêdi ji Tırki hatine wergerandin. Wergerên pirtûkê, N. Kıriv, M. Ali K. ,Batal Aziz û Hesenê Metê ne. Pirtûk isal lı Swêdê, dı nav "Weşanên Welat" da derketiye.

**Jı nû va
derket !**

WILLIAM AEGLETON

**Mehabad
Kürt
Cumhuriyeti
1946**

Türkçesi:
M. E. Bozarslan

KOMKAR YATIRLARI

Zeynel Kurucalı

Wexta çûyinê nêzik bû, Memo, bi dîleki sar ji cihê xwe hêz da. Saqoyê xwe ê ku du mirovê weki wi têda bi cih dibû, ji bızmarê diwar ani xwar, li xwe kir, gorê xwe yê ris kir piyê xwe, kumê xwe kışande serê xwe û egala ku nasê Xelat dabûyê li stuyê xwe aland, berbî deri çû. Hê deri venekiribû, diya wi weke rojên bori li pêş sekini. Bi nezera hîzkirinê sermilê wi girt, serapê lê mêzekir. Destê xwe li seri gerand, kontrol kir ka guh û stuyê xwe rind pêçaye an na. Paşê deri bi destê xwe vekir û li benda derketina wi sekini. Memo, xwe berda kuçê û bi lez çû. Hê pîr dîr neketibû, dê, ji pişt va gazi kir, got:

- Her der qeşa ye, miqatê xwe be ez bi qurban! Li deran zêde nesekine, zû vegere were mal.

Memo hinek sekini û li ser milê xwe ziviri:

- Temam dayê, li ber nekeve, hema karê min xilas bibe ez li mal im; tu rind bızanibe. Paşê kete ser rê û çû.

Rê bi qeşa, der û dor ji hatibûn girtin. Memo lingê xwe di kortikan da rind bi cih dikir ku neşemite; gava ku meys didit, xwe bi diwarê xaniyên kêleka xwe va digirt.

Li Qerekilisê seqemeki bi tirs hebû. Sermaki wisa bû ku, Memo wetrê qey derziya di sûretê wi yê tazi ra radikin. Çavê xwe çarnikal li dora xwe gerand, guhê xwe mûç kir, dit ku tax bédeng e.

Carna ji çirina deriyan, ji dengê lingê mirovên ku ji kuçan derbas dibûn û ji dengê zarokên ku li der û dor dilistin pêştir deng tunebû. Lê bédengiya kuçê bi van dangan ji nedihate xirabkirin. Avahi kambax bûn, ji mirov wetrê qey bi erdê va ze-

liqine. Dûyê sergina, weke stûnan ji hîn kulekan dikişiya, belav dibû, wek koneki mijê ser bajêr digirt.

Gava ku kuçê xilas kir kete ser rê (cadde), bajar tîşteki şên bû. Edi mirov zêde diçûn û dihatin. Dema ku ji ber derê çayxanan derbas dibû, qijewijên bilind dihatin guhan. Taxûkên yekhesp girêdayi, bi xuşinek ziz ji serê rê heta dawiya rê di nav berfê da dişûlikin. Qeşa, weka rêşiyên bi biri û simêlê ajotvanan va zeliqbûn. Ewana çavên xwe her li mişteriyên digerandin, weki di nav tîşteki nedikete bira wan, qerisibûn û her tîşt ji bir kiribûn.

Memo, demekê weha bi rê da çû. Ew û hevalê xwe yê Misto tam di wextê da rasti hev hatin. Ev ne ras- thatinek xwe bi xwe bû. Li wê taxê ewana, timi di wê saeta rojê da hevdu diditin. Ne ew ne ji yê din, armanca çûyina xwe ji hev venediştartin. Lewra armanca herduyan ji yek bû û bi hev zanibûn.

Bi xeberdan heta dawiya rê çûn. Şikil nehatibû guhurandin, weke rojên berê bû. Li holê sergoyê esker, li ser sergo çend se (kûçik) sekinine, li dora wan çend zarok civiyane û li pişt zarokan ji çend seyên birçi sekinine. Tev bi hevra li cihek dimihêrin -li hêviya bermaya xwarina esker bûn- ku binin ser sergo.

Wext sekiniyê, zû bi zû derbas nedibû. Mirov wetrê deqqe pêşda naçin. Ku ereba bermaya xwarinê dereng biketa. seqemê zêdetir li wan hukum dikir. Ji sermayê, tili û pêçiyên dest û lingan çiqas diçû ditevizin. Netika tazi û sûretên vekiri ji, ji ber sermayê weke wan jan nedida. Lê pîr mixabîn, zarok li dij wê seqe-

ma hişk dı berxwe dıdan. Dıgeriyan, beri hev dıdan û bı hev dilistin. Car-na ji, yeki dengxweş kılam dıgot yê mayin ji lê vedıgerandin, an bı destê hev dıgirtın an ji dest dıdane ser milê hev û govenda Kurdi dilistin. Ev yek lı dora sergo helqeyek çêdikır û dibû tevgerike gran.

Gava dengê "hate!" hat bıhistın, govenda wan a geşbûyi dı cida sekını. Gıška lı yek nuqtıyek dınihêri, lı ereba esker a ku dıhat! Şahi û kêfa wan piçek reviya, mırûz kırın û dılsar bûn. Reng lı teva xırabû, madê xwe kırın û ji hev dılsar bûn. Hez-kırına hevaltıyê jı bir kırın, danine aliki û lı hember hev sekının weke hêkeleke cemedê.

Memo lı sergoyê, lı bermaya xwarınê cardın rınd mêze kır. Cihêki rınd jı xwe ra kış kır. Paşê lı hevalên xwe yê lecê nihêri. Dılê gıška hebû weke wi berevkın. Gışk, weke tirê kevanê amadeyê lecê bûn. Lê belê seyek xayin lı milê rastê yê Memo sekınibû. Rewşa wi ne baş bû, awırên wi wek dijmin bû. Çavên wi yê bı xwin qet û qet baweri nedıda Memo.

Memo kır ku cihê xwe bıguhêze, jı xwe ra cihêk dın kış ke. Lê belê cardın poşman bû. Wextê êdi derbas bûbû. Ereba esker nêzikahi bı sergo kır. Cıguhastın êdi feyde nedıda Memo nedıxwest destvala vegere mal, pêwist bû tişteke xwarınê bı xwe ra bıbra mal. Gava serê sibê jı mal derket, dê pişt va gazi kırıbû: "Lao, lı ciki nemine, zû vegere mal!" Gelo çıma? Tenê jı bo Memo bû ev gazıkırın? Naxêr, lewra bırayên Memo dı mal da birçi bûn. Memo, ku weha dūr û dirêj dıfıkırı bırayên wi hatine ber çavan. Xeyal kır, wana yeko yeko ber çavê xwe ra derbas kır, lı wana û halê birçibûna wan nihêri. Dılê wi şewiti, çavên wi xumam girt.

Hetani dawiyê dı wi halı da wısa ma. Lê belê gurina erebê wi jı wan xeyalan şıyar kır. Hişkê xwe ani serê xwe, lı ereba ku nêzikê sergo dibû cardın mêze kır. Erebe sekını. Dergê

şofêrxanê vebû, sereskerek (onbaş) û sê esker xwe jı erebê avitne jêrê. Eskeran tev bı hevra awırên tûj dane zarokan. Wana, weke rojên bo-ri tişteke jı wan zarokan ra negotın. Lê pır mıxabın, fesalên wan xırabûn. Awırên serdest yê weke mêra, êdi zarokan dın-har dıkırın.

Leşkeran paşê bidonan serdev û rû berjêr kırın, bermaya xwarınê vala kırın û çûn. Pey çüyına wan, leca jiyanê lı ser sergo destpêkır. Seyên birçi, yan hestıyek yan jı keriki nan zûzû hıldıdan, dıkotın û dıxwarın; dest û lepên zarokan, weke makinan dıçûn û dıhatın. Memo, cara ewılın kerıyek nanê mezın dıt avête tûrê xwe. Gava kû ewi, ew nana bı şabûn avite tûr, dı gemarê da keriki mezın tır ket ber çavê wi. Wek cara ewılın berbı wi nani jı hat ku hilde. Lê belê jı bo hılanına wi kerıyê gir ew tenê nin bû. Seyê gewr yê gir jı, lı ber wi nani xwe telandıbû. Yek bı dest, yek jı bı dev xwe bı hevra avitne nan. Çavê seyê gewr, jı qasek berê zêdetır xwin girtıbû; weke dijmin dınihêri. Nan hişk, jı nişkava rahê-la Memo, dıranê xwe yê tûj dı destê Memo da derbas kır. Memo nızanıbû çı lê qewımı, hım qariya hım jı xwe jı para kışand, ku jı se xilas bıbe. Lê pır mıxabın, zêde dı ber xwe neda, ew berxwedan jı êşê zêtir tişt neani. Memo dı nav wê êş û tırsê da, bı destê xwe yê dın kulmeke zexm lı serê se xıst. Se, Memo berneda. Bı hêrseke mezın lı vi ali wi ali bir û ani, qilê (dıranê) xwe dı bedena wi da dıçıkand. Bı her qilçıkandınê ra Memo, xwe dıciwande ser hev, goşt jı bedena wi dıqetiya û xwin jê dıkişiya. Gava seyên dın jı çav bı xwinê ketın, weke gurên har bû xırına wan û êrişi ser laşê Memo kırın.

Piştı demekı kurt her tişt xilas bûbû. Lı ser sergo Memo, dı nav xwin û gemarê da bûbû kerı kerı. Ne dıkarıbû vegere mal ne jı tişteke xwarınê jı bırayên xwe ra bıbe. Jı bo parıyek bermaya xwarınê, jiyan lı Memo hatıbû dawı.

Werger: Bavê Zınar



ZAROK

Çivik û Tora Nêçirvan

TOLSTOY

Werger: X. LEZGİN



Nêçirvan li qeraxê golê, ji bo çivikan dafikek danibû. Bî toreke zehf mezî gelek çivik girtibûn. Lê ew çivikana ewqas mezî bûn ku, wan tor ji bî xwe ra kaşkirin û firyan. Çaxa wan firdan û bî hewa ketin, nêçirvan ji li dûv wan reviya û kir ku xwe biğhine wan û wan biğire. Dî rê da rasti cotkareki hat.

Cotkar jê pîrsi:

<< Tu kuda dibezi? Qey tu bawer diki ku tê bikarîbi wan biğri? >>

Nêçirvan bersiv da:

<<Eger dî hundurê wê torê da tenê çivikek hebûya, hingê rast e, wek gotina te, min nikarîbû ew biğirtana. Lê ezê niha wan biğirim>>

Rasti wek gotina nêçirvan bû.

Dema bû êvar, her yek ji wan çivikên dî torê da, xwast ku vegere hêlina xwe. Her yekî tor

berbî aliyê xwe va kişand. Yekî berbî daristanê kaşkir, yê dî berbî avzêlê, hînekan ji berbî zevîyan kaşkirin. Dî dawiyê da gîş westîyan û bî torê va li erdê ketin û wisa man.

Nêçirvan ji hat û yek bî yek ew girtin.

Teyr

Teyreki hêlina xwe ji deryayê (behrê) dîr avakiribû. Piştî ku hêlina xwe çêkir û xilaskir, gelek cûcîkên (çêlik) biçûk û xweşik derxist.

Rojekê ji rojan, masiyekî pîr mezî bî pençeyên xwe pit girtibû û vedigeriya hêlinê. Hat û dit ku gelek mirov çiviyabûn li derdora dara ku hêlina wê li ser bû. Gava wan mirovan ditin ku dî nav pençeyên teyr da masiyek heye,



kırın qêrin û destpê kırın kevir avêtine teyr.

Teyr masi ji nav pençeyên xwe berda û wan mirovan ew hildan û ji xwe ra bîrin.

Teyr hat li ser rexê hêlinê dani û li halê xwe yê perişan fikiri. Çêlikên belengaz ji, ji birçina dest bi grînê kırin.

Teyr pir westiya bû. Wisa westiya bû ku ji hêz ketibû; nîkaribû ji nû va careke din here ser behrê û masiyeki din bine. Di ciyê xwe da melisi û baskên xwe li çêlikên xwe pêçand, û pûrta wan a

nerm û tenik mızda. Mîna ku ji wan dixwast ku hineki ber xwe bîdın. Lê hingi maka wan ew mızdınan, wan ji destpê dıkir bı dengeki bılındtır dıqıjıyan.

Lê dayika teyr, baskên xwe çırpand zarokên xwe ji xwe dûrxıst. Ji ser gir fıriya çû li ser guliyê dareki dani.

Vêca çêlikên wê hin bêtır bı dılşewati gıriyan.

Teyra belengaz nıkarıbû zêde tehamul bıke. Wê bı qêjineke bêhempa baskên xwe vekır û wek tireki ji ciyê xwe pekiya û berbı behrê fıriya û çû.


Dema vegeriya êdi tari ketibû erdê. Hêdi hêdi nızım fıriya û nêziki hêlinê bû. Di nav pençeyên wê da masiyeki mezin hebû.

Wexta nêziki darê bû, li derdora xwe baş mêzekır. Gelo disa hin kes hebûn li wir? Dıt ku kes tune baskên xwe di ber xwe da berda û li kenarê hêlinê dani.

Teyrên bıçûk, nıkulên xwe vekırıbûn û li benda xwarınê bûn. Dayika wan ew masi parçe parçe kır û zıkê wan pê têr kır.

□

Ferhengok





NEWROZ-89: Didemek ji şahiyeke Newrozê (KOMKAR, Elmanya Federal)

....

Ey Deh'akên dema me!

Ey xûnrîjên gelê me!

Em xurtîrîn ji we

ji balefirên we

Em xurtîrîn ji kimya û gazan

ji alaf û şewatan

Em xurtîrîn ji va cihana derewin

ji bazar û kîrîn

ji bazar û kîrîn

Ev ax û ofên me

Ev kula dilê me

Ev kela xûna me

Lî ber bê naçîn

Wînda nabîn

Namrîn...

....

GUNDI



Didemek ji mitinga 19'ê Adarê li Diyarbekrê